Partiya Doza Azad

# BERNAMEYA
# Partiya Doza Azad

Payiz 2013

# BERNAMEYA PARTIYA DOZA AZAD
# 2013

# *Naverok*

**A - DESTPÊK** ........................................ **07**

GELO PÊDIVÎ BI PARTIYEKE NÛ HEYE?
ÇIMA PARTIYA DOZA AZAD?
RÊGEZ Û MEBESTÊN VÊ BIZAVÊ ÇI NE?

**B - MAF Û AZADIYÊN BINGEHÎ** ........................................ **13**

**1 -** MAFÊ JIYAN Û EWLEHIYÊ (EWLEHIYA CAN)
**2 -** AZADIYA RAMAN, ÎFADEKIRIN Û RÊXISTINBÛNÊ (EWLEHIYA EQIL)
**3 -** AZADIYA BAWERÎ Û PERESTINÊ
**4 -** AZADIYA PERWERDEHÎ Û XWE BIPÊŞXISTINÊ
**5 -** MAFÊ MULKIYET Û MÎRATÊ (EWLEHIYA MAL)
**6 -** AZADIYA GERÎNA LI MAFÊN XWE Û SERXWEBÛNA DARAZÊ
**7 -** MAFÊ ZEWACÊ Û SAZKIRINA MALBATÊ (EWLEHIYA NIFŞÊ)
**8** - JINIK, ZAROK, ASTENGDAR Û BEŞÊN DIN YÊN BI DEZAVANTAJ
**9 -** DESTNEDAYÎNA MESKEN Û AZADIYA RAGIHANDINÊ
**10 -** MAFÊ RÊWÎTÎ Û ÎQAMETÊ
**11 -** MAFÊ HILBIJARTIN, HILBIJIRÎN Û BEŞDARBÛNA RÊVEBERIYÊ
**12 -** MAFÊ ŞIXULÎN, BÊHNVEDAN, MESLEK Û SENDÎKA
**13 -** MAFÊ TENDURISTÎ, XWEYÎBÛN Û HEWÎNÊ

**C – RÊXISTÎBÛN, AMANC Û ERKÊN DEWLETÊ** ........ **25**

**1 -** MAKEZAGONA NÛ Û DAXWAZÊN GEL
**2 -** NÊRÎNA LI ERKEDARÊN GIŞTÎ Û HEMWELATIYAN
**3 -** KÊŞEYA KURD
**4 -** BIHÊZKIRINA RÊVEBERIYÊN MEHELLÎ Û RÊVEBERIYÊN JI CIYÊ WÊ
**5 -** KÊMJIMARÊN NÎJADÎ Û OLÎ, PÊŞÎLÊGIRTINA NÎJADPERESTIYÊ Û CIYAWAZIYÊ
**6 -** ZELALKIRINA ERKÊN RAYA GIŞTÎ, NEQANÛNÎ Û TÊKOŞÎNA LI HEMBER BEDKARIYAN
**7 -** ÇAND Û DÎROK
**8 -** PARASTINA HAWÎRDOR Û SIRÛŞTÊ

**D - EKONOMÎ** ........ **39**

**1 -** DESTPÊK
**2 -** POLÎTÎKAYA ME A EKONOMIYÊ
**3 -** TÊKOŞÎNA LI HEMBER FEQÎRTIYÊ – PARVEKIRINA DAHATIYAN
**4 -** HERÊMÊN JI ALIYÊ EKONOMÎK VE LI PAŞ MANE
**5 -** MÊZÎNA ÎTXALAT Û ÎXRACATÊ – MALIYETÊN HILBERANÊ
**6 -** MALIYETÊN ENERJIYÊ – ENERJIYA NUKLEER
**7 -** ZÎRE'ET Û AJALDARÎ / XWEDÎKIRINA HEYWANAN
**8 -** VEGERA BI BAL GUNDAN VE Û PÊŞVEBIRINA GUNDIYAN
**9 -** AJOTINA 'ERAZIYÊN XEZÎNEYÊ
**10-** PÊŞÎLÊGIRTINA ÎSRAFÊ Û NEQANÛNIYÊ, BI AWAYEKÎ BERDAR BIKARANÎNA ÇAVKANIYAN

**11 -** KÊMATIYA BUDÇEYÊ Û DEYNDARIYA GİŞTÎ
**12 -** DADMENDIYA BACÊ
**13 -** PÊŞXISTINA DARISTANAN, SERERASTKIRIN Û ŞIXULANDINA WAN
**14 -** BAZIRGANIYA SÎNOR

**E - POLÎTÎKAYA DERVEYÊ WELAT ............. 53**

**F - POLÎTÎKAYÊN CIVAKÎ ............................ 61**

**1 -** PERWERDEHÎ
**2 -** TENDURISTÎ
**3 -** EWLEHIYA CIVAKÎ Û SUXREYÊN CIVAKÎ
**4 -** MALBAT Û JIN
**5 -** XORTANÎ Û WERZÎŞ
**6 -** HEMWELATIYÊN ASTENGDAR
**7 -** MAFÊN GIRTÎ Û MEHKÛMAN
**8 -** ÇAND Û HUNER
**9 -** ÇAPEMENIYA NIVÎSKÎ Û DÎTBARÎ Û RAGIHAN
**10 -** ZANIST Û TEKNOLOJÎ
**11 -** BAJARBÛN Û XANE
**12 -** TRAFÎK
**13 -** GIHANÎ
**14 -** HAWÎRDOR
**15 -** TURÎZM

**G - ENCAM ................................................ 81**

# A - DESTPÊK

Cenabê Ellah, dinya û hemî tiştên di nav de ji bo pêdiviyên mirovan afirandiye û pêşkêşî xizmeta wan kiriye.

Di encama destdirêjiyên li afirîşa mirovê ku bi awayekî herî xweşik hatiye afirandin, hemî mirovahiyetê winda kiriye. Afirîşa ku di encama van destdirêjiyan de xirabûye divê ji nû ve bê avakirin. Vegera însanî bi bal afirîş û hêsinê xwe ve, dibe babetê derketin û xilasiya ji qeyranên me'newî. Pey vê êdî mirov dikare wezîfeya xilaskirina hemî mirovahiyetê hilgire.

Nêrîna "Mirov gurê mirov e", encama biyanîbûna civaka me ji hêsinê xwe aniye holê. Li gor çand û şaristaniya me; ji aliyê afirandinê ve hemî mirov ji dê û bavekî ne; bi awayê zaryên Cenabê Adem û Hewwa xuşk û birayên hev in. Destûra bingehî a jiyanê ne şer û pevçûn e, piştgirî û alîkariya hevûdin e.

Bi mercê ku afirîşa wî xiranebûbe "Bira, zilmê li birayê xwe nake, di tengasiyê de wî bi tenê nahêle." Divê bi zindîkirina van hêjayiyên bilind, mirov û civakeke ku xwedî van hêjayiyan e û van hêjayiyan di jiyana xwe de pêk tînin bê avakirin. Di ber vê de serifandina çi hewlên ji destê me tê, li ser me wan kesên ku digel hemî mercên negatîf yên derve hewl dane ku xwe biparêzin û li hember êrîşan liberxwedane, deyn û erkek e.

Em ne li pey îdealên mîstîk in; ku lingê wan pêl erdê nake û ji rastiyê hatine muceret kirin, derfet û dibetiya bicîanîn û pêkanîna wan nîne. Îdealên me yên ku em bawer in dê pêk bên hene. Ji bo ev îdealên me pêk bên, em bi 'ezm in ku heya hêz û derfetên me destûrê bide bi

kesên baweriyê bi van îdealan tînin re, di vê rêyê de, ji bo çêkirina çareseriyên realîst bimeşin.

Bi kurtasî; di bawerî û ramanên me de, îdealîzmeke ku realîteyê dibîne û realîzmeke ku îdealên me nade jibîrkirin pevdigêje.

Ferd û civakeke ku bê amanc, xaye û bername ye, mebesteka wê ya ku dê bighêjê jî nîne. Yên ku amanceke wan heye bi rê ve diçin, yên ku amanceke wan nîn be bi tenê digerin. Bi qasî ku em îdealên xwe bikin mebest û bi rê ve herin, em hêvî dikin ku heta hêz û temenê me destûrê bide emê bighêjin qonaxê.

## GELO PÊDIVÎ BI PARTIYEKE NÛ HEYE? ÇIMA PARTIYA DOZA AZAD?

Li Tirkiyê desthilatî û partiyên hene;

Di şûna ku bi pirsgirêkan re rû bi rû bibin û çareseriyan hilberînin, berdewamî diexirînin,

Di şûna ku maf û azadiyan nasbikin û bikaranîna wan pêkbînin bi hinek mercan ve girêdidin,

Di şûna ku pirsgirêkan bi awayekî payîdar çareser bikin û çareseriyê bi sazîkin, tedbîrên muwaqet bes dibînin û bes didin nîşandan,

Bi taybet nejidilbûniya wan a di rakirina astengên li pêşiya jiyandina baweriyê û di mijara çereserkirina pirsgirêka Kurd de û bikaranîna wan a çareseriya van pirsgirêkan bi awayê amûreta ranta siyasî û arguman,

Bi ser ku her yek ji wan bi tenê nûnerê beşek ji aliyên cuda yên civakê ne, xwedîtina nûnerê hemî civakê an jî nûnerê hemî aliyekî kifş, tevgerîna wa a weke ku di meqamê nûnertiyê de û inyatkirina îdeolojiyên xwe bi ser gel de,

Jibîrkirina wan a peymanên xwe yên di derbarê

guhertin û hilanîna ne'adiliyên destûra Partiyên Siyasî û destûrên hilbijartinê,

Digel vana;

Bi destnexistina dadmendiya civakî,

Gihîştina biryar û karên dadgehên ku wezîfedar in dadmendiyê belavkin, rewşeke ku ujdana civakê nerehet bike,

Di oxira berjewendiya siyasî kaşkirina civakê bi bal berberiya nijadî ve,

Di oxira debirîna baş bi giregirên dinyê re aligiriya zilmê an jî temaşevantiya zilmê,

Berxwedana sîstemê a ji bo ku bi nirxên civakê re li hev neyê,

Pey hatina ser desthilatiyê xwedîderketin û ahengiya kesên ji sîstemê gilîdar in bi sîstemê re,

Gihîştina dejenerebûna siyasî bi bal asteke mezin ve,

Û a herî girîng jî, maşandina nirxên civakê û zêdebûna hewlên bêşexsiyetkirina civakê, nedana reaksiyona divê a li hember encamdana bêşexsiyetkirina civakê, di me de ramana ku pêdivî bi tevgereke siyasî a nû heye çêkir.

Digel vêna di devereke ku komên ji nûneriya siyasî pêmen in hene, bidestxistina aşîtiya civakî û rûniştandina wê ya li ser bingeheke zexm ne karekî pêkan e. Li ser xwestek û ranavîşên gelek kes û komên xwedî raman ku tu partiyên siyasî yên hene nûnerê xwe nabînin bi baweriya ku dema sazkirina tevgereke siyasî hatiye em derketin rê.

## RÊGEZ Û MEBESTÊN VÊ BIZAVÊ ÇI NE?

Ev Bizav;

Bawer dike ku 'edalet ji bo tu tiştî nayê fedakirin.

Kirin û gotinên tu kesî ku beden, rûh û mêjiyê civakê xirakin, wek azadiyê nasnake.

Bawer dike ku, teqez divê ji bo mafên hemwelatiyan yên azadî, perwerdehî, tenduristî, ewlehî û jiyaneke bi mirovahî bê parastin dewlet hemî tedbîran divê bigre.

Mafê bikaranîna tu sazî an jî kesayetî a mal, hebûnî û derfetên di destê wî de ne bi awayekî ku bibe sedemê ziyana kesayet, sazî an jî giştiyê civakê, napejirîne.

Ev bizav; bangewaziyê dike ku avakirina 'edaletê amanca wê a yekem e.

Amancên me yên din;

Ji nû ve te'rîfkirina dewlet û siyasetê,

Hilgirtin û serdestkirina nirxên bingehî yên civakê li ser siyasetê,

Ne ku civakê bi sîstemê re, lihev anîna sîstemê bi nirxên bawerî yên civakê re,

Ji nûve zindîkirin û saxkirina nirxên Îslamî û mirovahî yên ku nava wan bi zanebûn an jî bê zanebûn hatiye valakirin û bi rastî me divegerînin hêsinê me,

Temînkirina ewlehiya can, mal, ol, eqil û nifşê,

Temînkirina naskirina maf û azadiyên bingehî yên însanî bi awayekî rastîn,

Rakirina astengên li pêşiya azadiya perestin û baweriyê,

Temînkirina çareseriya kêşeya Kurdî di bingeha dadmendiyê de,

Ji dejenerebûna exlaqî û ji bême'newiyatiyê re gotina: êdî bes e,

Temînkirina lihevparkirina li gor heqiyê û 'edaleta civakî,

Rakirina bê'edaletiya di hevparkirina dahatiyan de û ragihandina halxweşiyê di nav hemî gel de,

Tevkariya aşîtî û aramiya civakî,

Temînkirina ‘edalet, serbixwebûn û bêalîbûna dadgehiyê,

Bicîkirina ‘edaletê di tewereya têkiliyên bi derveyê welat re,

Bi welatên cîran re derbaskirina baş e.

# **B –** MAF Û AZADIYÊN BINGEHÎ

B

Çi mirovên hene, bi sedem ku mirov hatine afirandin digel afirandina xwe xwediyê hinek maf û azadiyan e. Hetta ku hê di rehma dayika xwe de hinek mafên wek mafê jiyanê dest pê dikin. Ev maf teqez in, nayên veguhastin, dev ji wan nayê berdan û nabin mijara bazarê. Wezîfa dewletê ew e ku; van mafan têxe bin temînatê, men'a kesên zêde bike ku mafên kesên hindik in ranekin û necûn.

Dest nayê dayîn, eslê van mafan û ji bo rakirina van mafan an jî bi awayekî piranî bisînor kirina wan destûr nikarin bên deranîn. Di rewşên meşrû û pêwîst de bi mercê ku destneyê dayîn eslê wê li gor pêdiviyên wê û li gor ku bi sînor kirin bi qasî amancê be, encex bi destûrê û ji bo çendemekê dibe ku bê bisînor kirin.

## 1 - MAFÊ JIYAN Û EWLEHIYÊ (EWLEHIYA CAN)

Mafê Jiyan û ewlehiyê ji mafên afirîşî ne. Ji bo însan a resen mafê jiyan û ewlehiyê ye. Heta ku sedemekî rewa nîn be ev maf ji holê nabe ku bê rakirin û sînorên wî werin teng kirin, dewlet jî vî mafî nikare bicû bike.

Divê di serî de dewlet rîayetê mafê jiyan û ewlehiyê bike. Bi destê dewletê têkilîpêkirina mafê jiyanê, divê bi encamên girantir ji têkilîpêkirina hemwelatiyekî ji hemwelatiyekê din re ve bê girêdan.

Mafê jiyanê, ji bo ku mirov jiyana xwe bidomîne pergandina pêdiviyên bingehî ji alî dewletê ve jî di xwe de dihewîne. Dewlet mukellefe ku, pêdiviyên feqîr û hewcedaran ji bo jiyana xwe bidomînin pêkbîne. Jiyaneke li gor rûmeta mirovahiyetê a ferdên civakê ji wezîfeyên dewletê ye.

## 2 -AZADIYA RAMAN, ÎFADEKIRIN Û RÊXISTINBÛNÊ (EWLEHIYA 'EQIL)

Taybetiya mirov a herî xwiya û cudaker 'eqil û ramanên ku fêkiyên 'eqil in. Mirov bi melekeya xwe ya 'eqlî ji heyînên din cuda dibin. Azadiya raman, di heman demî de mafê azadiya parvekirina ramanên xwe ji civakê re û li dor ramaneke diyarî rêxistinbûnê jî di xwe de dihewîne.

Ji bo ku 'eqil, karê xwe pêk bîne divê azadiya ramanê hebe. Rêyeke gihîştina 'eqlekî hevpar jî ew e ku; ferd bala xwe bidin meseleyên civakî, ji bo çareseriya pirsgirêkan bifikirin û van raman û fikrên xwe bi civakê re parvebikin. Pêşketina civakî bi hebûna mirovên ku ramanan hilberînin pêkan e. Pêşîgirtina ramanan, neheqiya herî mezin e ku li mirovahiyetê bê kirin û ji fitreta mirov re zilm e.

Heqaret, bêbextî, serîlêdana tundiyê, nîjadperestî, îmtiyaz, kêmxistina girîngiyên civakê û parastina karên hemberî afirîşa mirovî di çarçova azadiya ramanê de nabe ku bên nirxandin û hîmaye kirin.

Digel vê têkoşîna li hember alkola ku 'eqlê însan pûç dike, qedexekirina arîşeyên hişyarker û narkotîk; pêşîlêgirtina bi rêyên peyamên binî pêpêloka ku bê ku mirov pê haydar bibin wan têxe bin bandora xwe de, pêşîlêgirtina xebat û weşanên ku bêexlaqiyê weke tiştekî tebi'î nîşandidin, ha vana teva em weke rakirina astengiyên li pêşiya ewlehiya 'eql û azadiya ramanê dibînin.

## 3 - AZADIYA BAWERÎ Û PERESTINÊ

Ji bilî baweriyên xerifî yên li dijî afirîn û afirîşa mirova ne, pêwîst e her kesek di pêkanîna perestina li gorî ola xwe serbest be. Pêwîst e ev azadî bi makezagon û zagonan di bin temînatê de be.

Azadiya ol û ujdanê heman demî de, pêkanîna pêdiviyên baweriyan bi awayê ferdî û civakî û bo vê amancê civîn û rêxistinbûna bi kesên weke wî bawerdikin re jî di xwe de dihewîne.

Jiyana mirov a li gor baweriya wî, hînkirina ola xwe ji kesên li gor xwe rêzdar, perwerdekirina zarokên xwe li gor ola xwe û mafê zornedayîna wî yê ji kirinên hemberî baweriya wî jî di vê çarçoweyê de ne. Li gor vê yekê di hemî saziyên dewletê de pêwîst e nixumandin û cil û bergên li gor baweriya hemwelatiyan serbest bê berdan. Di pêkanîna baweriyên xwe de di navbera sehayên bi taybetî û gelemperî de nabe cudahî hebe.

Ji bo kesên di saziyên gelemperî de dixebitin bi hêsanî karibin 'îbadetên xwe bikin divê cihê minasib bên avakirin û divê xebatkar karibin li gor baweriya xwe bi cil û bergên minasib karê xwe bikin.

Dewlet, divê selahiyeta şekildana olan di xwe de nebîne û Serekatiya Karên Diyanetê a ku ji bo vê amancê di salên 'ewil yên Komarê de hatiye sazkirin bê xweser kirin.

Dewlet mecbûr e ku hemî astengên li hemberî jiyandina baweriyê rake. Dewlet bi xwe jî nikare dest bide baweriya hemwelatiyan. Pêwîst e tezyîqat û tehdîdên li hember ol û oldaran nîn bin. Mafê dewletê tune ye ku, dê kîjan hemwelatî baweriyê bi kîjan olê û bi çi awayî bîne, baweriyê bi çi bîne û bi çi neyne destnîşan bike. Nikare destê xwe dirêjî awayê ku baweriya xwe dijî bike. Ji kî tê bila bê divê pêşî li hemî zordestî û tezyîqatan bê girtin.

## 4 - AZADIYA PERWERDEHÎ Û XWE BIPÊŞXISTINÊ

Ziman, netewe, zayend û ola wî çibe bila be herkes xwediyê mafê perwerdehiyê û xwe bipêşxistinê ye. Tu kes bi sedem ziman, netewe, zayend, ol û cil û bergên xwe nabe ku ji vê mafê bê mehrûm kirin.

Dewlet, dema wezîfeyên xwe yên di derbarê perwerdehî û hînkirinê de bicî tîne nikare cudayîbûnê di navbera hemwelatiyan de bike. Dewlet, mecbûre ku perwerdehiya mecbûrî bê pere bide.

Perwerdehiya olî a zarokan, bi awayê ku welî dixwaze divê bê dayîn. Ji tu zarokî re perwerdehiya olî a ku weliyê wî naxwaze nabe ku bê dayîn. Mafê perwerdekirina olî a tu weliyên zarokan jî nabe ku pêşî lê bê girtin.

Perwerdehiya bi zimanê zikmakî ji bo herkesî mafekî mirovahî û tebî'î ye. Perwerdekirina zarokan bi zimanekî ku nizanin hemberî wekheviya firsenda perwerdehiyê ye.

## 5 - MAFÊ MULKIYET Û MÎRATÊ (EWLEHIYA MAL)

Mafê mulkiyetê yê herkesî, serbixwe an jî bi şirîkatî heye. Tu kes ji mafê mulkiyetê bi awayekî kêfî nabe ku bê mehrûm kirin.

Xwedîbûna mal û teserufa li ser pêwîst e li gor çarçoveya meşrû be. Tu kesayetên hukmî an jî heqîqî ne xwedî mafê bikaranîna mal, serwet û îmkanên di destê xwe de li hember kesekî din, sazî an jî hemî civakê ye.

Tu kes ne xwedî mafê îsraf kirin an jî winda kirina tiştên xwediyê wê ye.

Mafê bi desxistina mal; parastina malê li hember dizî, xesp û bacên bi neheqî jî di xwe de dihewîne.

Dewlet, dema di derbarê dan û sitendina mulkiyeta bi taybetî û bikaranîna wan de bacan danî divê çawaniya mulk û mercên hemwelatiyan bide ber çavê xwe. Dewlet, divê pêdiviyên jiyanê destnîşan bike û di bidestxistina wan de pêwîst e alîkariya hemwelatiyên xwe yên ku rewşa wan a malî xirab e bike. Dewlet, divê di derbarê pêdiviyên zerûrî de hemwelatiyên xwe wek deriyê desketiyê nebîne û bi bacan divên van zerûretan nexe rewşeke ku nikarin bigêjinê. Mînak, divê dewlet

bacê ji kesên ku xanîkî wan nîne û bê amanceka wan a ji bo qezenc û tîcaretê hebe bi tenê ji bo rûniştinê xaniyekî ji xwe re kirîne nestîne.

Mafê mulkiyetê, mafê mîrat hiştina ji mîratxwirên xwe re jî di xwe de dihewîne. Dewlet nikare vê yekê ber sînor bike û bikaranîna vî mafî asteng bike. Di derbarê pay kirina mîratê de divê bi herkesî re heman mu'ameleyî bê kirin, li gor ku her civak karibin li gor bawerî û 'urfa xwe paykirina mîratê bikin divê sererastkirin bê kirin.

Mîrata kesên ku warisê wan nînin an jî nehatine dîtin, divê nekeve xezîneya dewletê, bê dayîn feqîran an jî bê dayîn foneke ji bo xêrên wek pê ciwanên feqîran bi tenê bên zewicandin, xwedîtî li pîrekên bi tenê bê kirin û ji bo pêdiviyên yetîman bê bikaranîn.

Divê sînor bê kişandin pêşiya xwedîbûna mulk ji bo kesên ne hemwelatî ne. Dema rewşeke ku gef li ewlehiyê bike hebe divê ji binî destûr neyê dayîn ku kesên ne hemwelatî ne li ser welêt bibin xwedî mulk.

## 6 - AZADIYA GERÎNA LI MAFÊN XWE Û SERXWEBÛNA DARAZÊ

Herkes li ber zagonan wekhev e.

Mafê herkesî heye ku li hember tecawizên ku mafên wî yên bingehî yên ku bi makezagonê an jî bi peymanên navneteweyî hatine nasîn binpêdikin bi serdana li dadgehên rayedar an jî merciyên îdarî bixwaze ku bi awayekî aktîf vê mafê wî bê parastin û mafê wî heye ku bi awayekî qanûnî bê parastin.

Mafê lêgerîna li mafê xwe mafê her ferdekî yê ku li serê minaqeşe nayê kirin e. Divê herkes karibe ji bo ku li mafê xwe bigere serî li dadgeh û merciyên îdarî bide.

Serîlêdana Dadgeha Makezagonê ji ber ku bi pera ye, ev yek dibe sedemê ku hemwelatiyên ku ji alî ekonomîk

ve qels in ji vê mafê mehrûm bimînin. Ji ber vê yekê divê di vê derbarê de sererastkirin bên kirin. Bi vê sererastkirinê tevî serîlêdanên bi îddîa binpêkirina vî mafî tên kirin divê ji dana xercê mu'af bên girtin û maddeyên ku ji kesên serîlêdanên wan nehatine qebûl kirin re cezayê pereyan raberî/pêşbînî dike divê ji merîyete bên rakirin.

Dewlet divê li hember zagonan wekheviya hemwelatiyên xwe temîn bike, serxwebûn û alînegirîyê bixe bin ewlehiyê.

Divê sererastkirinên ku dadgeran ji îdeolojî û ramanên wan yên siyasî serbixwe bike bêne kirin. Dadgerên ku li gor netewe, dîn û îdeolojiya kesê ku têne mehkemekirin an jî li gor statuya wan a civakî biryarên ji hev cuda didin, bi vî awayî hatibe fêmkirin ku alînegirîya xwe winda kirine, divê ji dadgertiyê bêne dûrkirin û xisara ku bûne sedem jî pêwîste bi wan bê tezmîn kirin.

Divê nakokiya navbera biryarên dadgeriyan bê rakirin û nîzameke dadgeriyê ku li gor kesan naguhere û her dem meriv dikare pêkbîne bê saz kirin. Ji bo vê yekê divê di nav sîstemê de kontrol û nîzamek bê çêkirin lê belê divê ev yek bi sererastkirineke ku dadgeriyê nexe bin îdareya rêveberiyê bê kirin.

Divê darêzgerî ji siyasetê dûr bê xistin. Divê ji nîzameke darêzgeriyê ku deriyê wê ji bandorên siyasî re vekirîne bê revandin.

Kesên di navbera wan de lihevnekirinek heye divê karibin binyad û hiqûqa darazê bi lihevkirineke di navbera xwe de tepît bikin, li gor vê hiqûqa ku hatiye tespît kirin divê îmkana te'yîn kirina dadgerekî bê dayîn. Divê mafê kesên di navbera wan de nîza' heye ku karibin sîstema hiqûqê a ku li gor bawerî û 'urfa wan e û kesayetekî ku rûmeta wî digrin ji xwe re bikin dadger bê dayîn.

Divê Dadgeriyên Cezayên Giran Yên Herêmî ku weke dewama Dadgeriyên Ewlehiya Dewletê û Dadgeriyên Xwedî Raya Taybet in û hemberî prensîba "Herkes li hember zagonan wek hev in" e bên rakirin û di binyad û qanûnên bicihanînê de prensîba 'edaletê bê bi bicihanîn. Sererastkirina bi awayê "Cezayên sûcên li hember dewletê hatine kirin" bi xwe re rejimeke qanûnî a derî 'adet aniye û di şûna nêrîna "dewleta 'adil" nêrîna "dewleta polîs" daniye. Divê dev ji sererastkirinên bi vî awayê ku di qanûnan de dibin sedemê ciyawaziyê û bê'edaletîyê bê qerîn.

## 7 - MAFÊ ZEWACÊ Û SAZKIRINA MALBATÊ (EWLEHIYA NIFŞÊ)

Her zilam û jinika ku hatibe çaxa zewacê, xwedî mafê zewac û sazkirina malbatê ye. Malbat bizrê civakê û temînata berdewamiya wê ye. Civakeke bi tenduristî bi tenê bi malbatên bi tendurîstî pêkan e. Ji ber vê yekê parastina saziya malbatê û teşwîq kirina sazkirina malbatê ji wezîfeyên dewletê ne.

Hemwelatiyên hatine temenê zewacê digel ku dixwazin bizewicin jî lê belê ji ber îmkanên wan nîn in nikarin bizewicin, Ji bo ku karibin bizewicin divê dewlet hemî îmkan û mercên pêwîst çêbike. Ji bo vê yekê ji budçeya giştî divê fonek bi taybetî bê cudakirin, mîratên kesên mîratxwirek di pey xwe de nehêştine jî divê bê dayîn vê fona hanê û bi vî awayî xort bên zewicandin.

Ji ber ku malbat, bingeha esasî ye di civakê de, divê destûr, biryar û planên di vê çarçovê de tên kirin, ji bo hêsankirina sazkirina malbatê, parastina wê û rûniştandina têkiliyên nav malbatê li ser bingeheke hiqûqî û exlaqî bêne kirin.

Malbat, bi zewaca zilam û jinikekê tê sazkirin. Bi têkiliyên fehşîtî wek homoseksual malbat nayê sazkirin. Ji vê re meriv nikare bêje malbat. Têkiliyên fehşîtî yên bi vî awayî ku pîroztiya malbatê ji holê radikin nabe ku ji alî civak û dewletê ve meşrû' bên qebûl kirin.

Nîkaha ku îmam dibirin ku; ev nîkah di nav civakê de belav e û bi baweriya civakê re têkildar e divê ji nav sûcan bê deranin û ji bo vê nîkahê statuyeke fermî bê temînkirin.

Li gor nêrîna Sekuler: "Kar û kirinên têne kirin li gor hiqûqê rast be bes e; li gor exlaq, xelet û li gor dîn, heram be jî tu qîmet û girîngiya vê yekê nîne." Zîna; ji alî piraniya civakê ve heram û bêexlaqiyeke mezin tê qebûl kirin, realîteyeke qet'î ye ku exlaqê civakê xiradike, dibe sedem ku nesil tevlî hev bibin û nêvenga aşîtî û aramîê xirabibe. Ji bo selameta civak û neslê, zînaya ku bi zordariya nêrîna sekuler ji nav sûcan hatiye deranîn, divê ji nû ve sûc bê qebûl kirin. Lewra qedexekirina zînayê ji bo ferd ewlehiya neslê biparêze mafekî mirovahî ye.

Di gel vê divê fehşîtîyên cînsî ku tevî mirovehiyetê gef dikin û pêşî li zêdebûna neslê digrin bên qedexekirin û bên xistin nav sûcan. Ev yek jî mafekî mirovahiyê di vê çarçoweyê de ye û tevî civakê 'eleqedar dike.

## 8 - JINIK, ZAROK, ASTENGDAR Û BEŞÊN DIN YÊN BI DEZAVANTAJ

Divê mercên xebatkirina jinan li gor pêdiviyê cinsiyeta wan bên sererastkirin. Di serî de perwerdehî û tenduristî, di saziyên ku bi tenê xizmetê didin pîreka de divê pîrek bên îstîxdam kirin.

Divê ji ber cil û bergên pêdiviya baweriya wan in ji jinên dixwazin bixebitin re asteng neyên deranîn. Jinikên ku zilamên wan nîne (wefat kiribe an jî berda be) jinebî an jî

zilamê wan nikaribe bişixule (ji ber astengdarî, girtîbûn, mehkûm an jî windabûnê) û naxwazin bişixulin divê nefeqa wan ji alî dewletê ve bê dayîn. Jinebî û sêwiyên ku sîgortaya wan a civakî nîne divê nefeqe, hewandin û xwedîkirina wan ji alî dewletê ve bê kirin.

Şixulandina zarokên temenê wan biniya Panzdeh salî ye divê bê qedexekirin. Zarokên ku ji ber di malbata wan de kesekî karibe bişixule nîn e dişixulin, divê mesrefên perwerdehiya wan ji alî dewletê ve bê kirin û da ku bi vî awayî karibin perwerdehiya xwe bidomînin. Di heman demî de divê di mîqdarê me'aşê esxerî/ herî kêm alîkariya malbatên wan bê kirin.

Divê nêrîn û xwedîkirina hemwelatiyên ku bi qasî nikaribin bişixulin astengdar in ji alî dewletê ve bê kirin. Hemwelatiyên astengdar yên ku karibin bişixulin, divê li gor karên dikaribin bikin bêne îstîxdam kirin û sererastkirinên li ser vê yekê divê bi lez bên kirin.

## 9 - DESTNEDAYÎNA MESKEN Û AZADIYA RAGIHANDINÊ

Meskena her hemwelatiyî xwedî mafê destnedayînê ye. Ragihandin serbest e. Ji bo pêşîlêgirtina sûcan, bi hincetên wek ewlehiya raya giştî an jî tenduristiya giştî û parastina exlaq û bi biryara dadgehiyê jî bi guhdarkirina nêveng axaftinên tu kesî yên li kargeh û meskena wî çênabe ku bê guhdarîkirin. Têkiliyên tu hemwelatiyî yên bi malbata xwe re bi tu hincetî çênabe ku bê kontrol kirin, ragihandina wî ya bi peyvikî, nivîskî an jî bi wêneyan çênabe ku bê şopandin û asteng kirin. Di vê mijarê de sererastkirinên qanûnî divê bi lez bêne kirin.

## 10 - MAFÊ RÊWÎTÎ Û ÎQAMETÊ

Her hemwelatî, bi awayê ku karibe di nav welat û derveyê welat de serbest rêwîtiyê bike xwedî mafê rêwîtî

û li ku bixwaze xwedî mafê lêrûniştinê ye. Bi sedem taybetiyên xwe yên cuda weke ol, bajar, netewe, mezhep û tiştên wek vana, heya sedemekî meşrû' û xwedî maf nîn be tu kes nabe ku ji vê mafê bê mehrûm kirin.

Bi sedem ku li dervî welat rûdinê tu kes nabe ku ji hemwelatîtiyê bê deranîn.

## 11 - MAFÊ HILBIJARTIN, HILBIJIRÎN Û BEŞDARBÛNA RÊVEBERIYÊ

Her hemwelatiyê ku şertan di xwe de dihewîne xwediyê mafê hilbijartin, hilbijirîn û beşdarbûna rêveberiyê ye.

Her hemwelatiyê ku temenê wî panzdeh salî temam kiribe û 'eqlê wî tam be xwedî mafê hilbijartinê ye. Ji bilî sînorên temen û tam bûna 'eqil divê tevî sînorên li ber hilbijartinê bên rakirin. Divê mafê hilbijartinê bê dayîn cezagirtî, leşker û serleşkeran.

Divê temenê hilbijirînê bê daxistin hijdeh salî.

Ji bilî artêş, mensûbên ewlehiyê, dadger û dozgeran divê mafê endamtiya partiyên siyasî bê dayîn hemî memûran û astengên li pêşiya endamtiya wan bên rakirin.

Kesên ku bi sedem sûcên siyasî cezagirtine, pey ku înfaza wan bi dawî bû ji bo karibin bibin endamên partiyên siyasî û bê hilbijirîn divê hemî astengên li pêşiya vê yekê bên rakin.

Rakirina benda hilbijartinê pêdiviya 'edaleta di temsîliyetê de ye. Benda hilbijartinê ku 'edaleta di temsîliyetê de, ji bo di rêveberiyê de îstîqarar bê destxistin feda dike tiştekî nayê qebûlkirin e.

## 12 - MAFÊ ŞIXULÎN, BÊHNVEDAN, MESLEK Û SENDÎKA

Mafê her kesî heye ku di mercên 'adil û musaîd de, bi awayekî azad karê xwe hilbijêre û li hember bê kariyê bê parastin.

Mafê herkesî heye ku, bêhna xwe berde, mesleka xwe hilbijêre, sendîka sazbike an jî kîjan sendîkayî bivê endamtiya wê bike; bê cudawaziyekê ji bo karê wekhev, bihayekî wekhev bixwaze, bi me'aş û bihayeke li gor rûmeta mirovahiyetê ji bo xwe û malbata xwe me'aşekî di derenca 'edalet û heqqaniyetê de bistîne.

Tu kes bi zorê nabe ku karekî nikare bike pê bê kirin. Tu kes nabe ku ji xebitîna yekî din desxistinekê neheq bidestbixe.

Awayê kar, naverok û se'etên kar; divê bi awayê ku meriv, karibin ferziyetên xwe yên olî pêkbînin, xwe bi awayê meslekî, siyasî, civakî û me'newî bipêşxin, mafê wanê ku dikaribin bi awayekî aktîf beşdarî bernameyê ji bo van amancan hatine amadekirin bê danîn ber çavan û bi vî awayî bên sererastkirin.

Divê dema xebat û mercên xebatê yên xebatkaran bên çêtirkirin, li hember kirinên hemberî vê yekê mueyyîde bên kirin, kontrolên di vê derbarê de bê zêdekirin. Divê pêşî li wê yekê bê girtin ku kesên kar didin, bi hêza malê xwe zilmê li kesên xebatkar nekin û kesên xebatkar jî bê sedemeke wan a meşrû hebe bi hêza civakê zirarê nedin sermayê.

Di sitendina memûran ji saziyên dewletê re, divê sîstemeke li ser 'edaletê bê avakirin. Pêşî li torpîl û cudawaziya zilamên xwe bê girtin, mîzên di vê derbarê de divê; ehliyet û besayî be.

## 13 - MAFÊ TENDURISTÎ, XWEYÎBÛN Û HEWÎNÊ

Xizmetên tenduristiyê ji erkên dewletê yên bingehî ne. Divê hemwelatî bi awayekî hêsan û belaş karibin bigihêjin van xizmetan û ji wan îstîfade bikin. Bi taybetî pêwîst e giraniya xizmetên di vê derbarê de bê dayîn herêmên mehrûm hatine hiştin û kêmasiyên van herêman yên derbarê tenduristiyê de bi lez bên telafî kirin.

Nexweşên ku her gav pêdiviya wan bi tedawiyê hene, bê ku prîma tenduristiyê didin an nadin bê nihêrtin an jî deynê wan yê prîma tenduristiyê heye an nîne bê nihêrtin divê tedawiya wan bê kirin.

Ji bo civakeke bi tenduristî, xweyîbûneke bi tenduristî pêdivî ye. Dewlet, divê piyaseya hilberana zadan bi awayekî tam bêxe bin kontrolê û mamulên ji tenduristiyê re bi zirar in bê ku bên şandin nav peyasê pêşî li wan bigre.

Dewlet, wek pêdiviyeke dewleta civakî; erka wê ye ku; xwedîkirina hemwelatiyên xwe yên ku nikarin pêdiviyên xwe bidestbixin, zarok, yextiyar û kesên pêdiviya wan bi alîkariye heye bike.

Ji bo herkesî mafê xweyîbûna meskeneke ku karibe tê de rûnê heye. Dewleta civakî vê pêdiviya kesên ku nikaribin mal û meskeneke ku tê de rûnin bidestbixin divê pêk bîne.

# C – RÊXISTÎBÛN, AMANC Û ERKÊN DEWLETÊ

Ji bo ku xizmetên wek ewlekarî, ‘edalet, parastin û perwerdehiya ku pêdiviyên mirovên li ser axekê dijîn, bipergal bên pêkanîn teqez pêdivî bi rêxistineke weke “dewletê” heye. Lê belê weke ku di civakên borî û dema me de tê dîtin, rêxistina “dewletê” ku ji bo xizmetê ji wan bike û bacan kom bike saz kirine pey demekê amanca xwe ya sereke ku ji gel re xizmet e jibîrkiriye û xwe ji bo xwe hesibandiye û gel xistiye xizmeta xwe. Mîrovan li hember vê rêxistina ku bi bacên xwe xweyîkirine îmkan nedîtine ku li ber xwe bidin û di bin tezyîqatên giran yên ku vê rêxistinê li wan bar kiriye de ‘eciqîne.

Yek ji tezyîqatên ku dewletê bi nêrîna “Digel gel ji bo gel” kiriye bi peyva “Ji bo gel a qenc ev e” ferzkirina îdeolojiyekê li ser gel e. Di encama vê yekê de kesên ku cuda difikirin û dibên: “Em bawer dikin ku feydeya civakê ji bilî vê îdeolojiya ku hûn ferzdikin di tiştekî dinê de ye” xayîn hatine îlan kirin û bi awayê herî tund hatine cezakirin.

Rêxistinên ku ji wan re tê gotin dewlet, ji bo piştgiriya beşeka gel bistînin, dewamî neyarên derve, tirsên bedgumanî û xeteran çêkirine. Gelan kirine neyarên hevûdin û bi îstîfade kirina ji vê hewaya ku çêkirine hewl dane ku hebûna xwe biparêzin. Hetta cih cih bi awayê saziyeke pîroz xwestine ku rêz ji wan re bê nîşandin. Mixabin ev leystik, di nav hinek beşên civakê de ciyê xwe girtiye û bi awayê parêzerê ji xeterên bedguman dewlet, weke avahiyeke pîroz qebûl dîtiye.

Em vê rewşa dewletê qebûl nakin. Dewlet, nikare tu îdeolojiyê li ser gel ferz bike. Dewlet, divê xizmetên ku

gel pêdiviya wê pê heye pêşkêş bike, ji bilî vê yekê divê dernekeve derveyê amanca xwe.

Li gor nêrîna me dewlet, rêxistineke siyasî û hiqûqî ye ku ji alî mirova ên ji bo pêşvebirina civakê û xwe bi awayê maddî û me'newî û ji bo amanca ku însan karibin bi hev re di nav azadî û ewlehiyê de bijîn hatiye sazkirin. Bi sedem rêxistineke ji alî mîrovan hatiye sazkirin e, tu pîroztiya wê nîne.

Wezîfa dewletê bi tenê ne temînkirina ewlehiyê, parastina li hember êrîşên ji derve tên, serkutkirina gengeşî û tevlîheviyan hundir, komkirina bacan, sazkirina rêxistina 'edaletê û kirina darizandinê ye û ji bilî van têkilî tu tiştekî din nebe. Dewletên bi vî awayî di qernên berê de mane. Li gor nêrîn û tetbîqata îro erk û berpirsiyariya dewletê û hikûmetên ku dewletan birêve dibin zêdetir bûne. Mînak; bi destê hêzên ewlehiyê nîzam û pergalê temîn dike, bi tedbîrên astengker pêşî li kirina sûcan digre; maf û azadiyên hemwelatiyan ji êrîş û binpêkirinan diparêze; saziyên perwerdehiyê vedike û li hember nezaniyê têkoşînê dide; li hember feqîrî û sefaletê têkoşînê dide, hewl dide ku sermaye û destketiyên neteweyî bi awayekî 'adil bê parvekirin; ji bo parastina raçînka civakî û malbatê tedbîrên pêwîst distîne, di vê çarçovê de pêşî li belavbûna bêexlaqî û xûyên xirab digre û li hember yên hene jî têkoşînê dide; pêşî li texrîb kirina hawîrdor digre; bi awayê bûyîna dewleta civakî birçiyan têr dike, kesên bê mal dike xwedî mal, xwedîtî li bêkesan dike, nexweşan tedawî dike; azadî, maf û malê yekî ji destê wî hatibe sitendin îade dike; di afetên tebî'î û civakî de, dighêje hewara afetjentiyan. Bi kurtasî mesûliyeta wê ew e ku xelasî û halxweşiya civakê peyde bike.

Awayê rêveberiya Komara Tirkiyê weke ku ji navê wê jî tê fêm kirin komar e. Komar jî bi ziman, reng û baweriyên

xwe tevahiya gel e. Weke salên destpêkê komareke bê gel, bi nêrîneke zordarî li dijî gel rêvebirina gel ne tiştekî pêkan e. Komar ew e ku; gel bi sedema parlementerên hilbijartiye xwe bi xwe rêvebibe.

Ji ber hikûmet raya xwe ji gel distîne yên ku têne rêveberiyê, li ser navê gel û wek nûnerên gel meqamên ku tênê dadigrin. Ji ber ku di meqamê wekaletê de ne li ser wan ferz e bi awayê ku wekaleta wan divê birêvebibin û karan li gor piraniya gel dixwaze bicî bînin. Tevgerên hemberê vê yekê tê wateya bikaranîna wekaletê bi awayekî xirab, derbaskirina sînorên raya hatiye dayîn wan û ji emanetê re xiyanet e.

Di rejima komarê a rast de, kesên ku rêveberiyê dikin ne hakimên teqez û muxtarên teqez in; hinek rayên bersînor û çarçoveya wan tê zanîn bikartînin. Mînak; yên ku rêveberiyê dikin, bi piştgiriya ji sedî not û neh a civakê be jî nikarin dest bidin mafê jiyanê û selameta hemî laşê ji sedî yek a civakê, nikarin zorê bidin wan da ku ola xwe biguherînin an jî dev ji ola xwe berdin û pêşî li perestinên wan bigirin, zimanê wan qedexe bikin.

Parlementoya ku raya xwe ya nûnertiyê ji gel distîne jî bêguman sînorên wê hene. Parlementoyeke bi vî awayî, bê sînorek di derbarê çi de bivê li gor xwesteka xwe nikare qanûnan çêbike. Divê nikaribe sererastkirinên ku ne li gor bingeha civakê ne û derdikevin derveyî rûmeta ji girîngiyên ku millet dike millet bike û divê qanûnên ku çêdike bi mafên însanan, prensîbê bingehî yên hiqûqê, exlaq û edebên giştî û bi bawerî û girîngiyên civakê re nekeve nakokiyê.

Kesên ku desthilatiya darêzgêriyê bikartînin jî sînorên wan hene. Kesên ku vê desthilatiyê bikartînin jî bi şîroveyan be jî, pêwîst e van sînoran derbas nekin.

## 1 - MAKEZAGONA NÛ Û DAXWAZÊN GEL

Makezagona 1982'yan a ku ji alî cûntaya 12'ê Îlonê ve hatiye amade kirin, gelek dûrî pêkanîna pêdiviyên civakê ye. Ev makezagon weke cilekî dîna ye ku bi zorê li civakê hatiye kirin. Xwesteka pirê civakê makezagoneke bi tevahî nû ye.

Divê bi lez makezagoneke sivîl a ku ji wesayet û îdeolojiyê hatiye safî kirin bê çêkirin.

Beşa destpêkê a makezagona nû divê kin û gelek wateyan di xwe de bihewîne. Bê ku li ser nijadê bê sekinandin, pêwîst e bi awayekî tund li ser maf û azadiyên însanî bê sekinandin.

Pêwîst e di vê makezagona nû de tu maddeyên ku "nabe bên guhertin" nebin.

Makezagona nû divê tu îdeolojiyê ferz neke, di vê çarçoveyê de metna sondê a ku hem parlementerên wê bê ne hilbijartin û hem jî memûrên ku wê di saziyên dewletê de wezîfe bikin dixweynin divê bê guhertin. Divê tu kes li ser girêdana îdeolojiyekê sond nexwe; lê belê divê herkes li ser xebatkirina ji bo feydeya gel sond bixwe.

Di makezagona nû a ku dê bê çêkirin de, pêwîst e bal bê dayîn pêdiviyên civakê, xwestekên gel û cudatiyan. Makezagona nû divê; bi awayê ku aliyên ji hev cuda yên civakê li ser paydariyên hevpar bigihîne hev û din, tu hemwelatî neyê dûrkirin û neyar neyê danasîn û mîzêna heq û 'edaletê bê danîn ber çava bê çêkirin.

Artêşa profesyonel divê bê damezrandin û xizmeta leşkeriyê a mecbûrî êdî ji mecbûriyetê bê deranîn. Di pêvajoya derbasbûnê de divê mafê redkirina ujdanî bi awayê mafekî bingehî yê însanî bê dayîn kesên ku naxwazin xizmeta leşkeriyê bikin. Bikaranîna vî mafî pêwîst e di pêşerojê de nebe sedemê mehrûm mana ji hinek mafan.

Divê mafê me yê ku ji vêga ve desketiyên zarokên me ku em serf bikin nîne û realîteya helezona deyn û faîzê ku hatiye asteke wisa ku serxwebûna welatan û yekîtiya axan gef dike bê danîn ber çavan û bi wî awayî budçeya denk bê amade kirin û ji dahatan zêde serf nekirin bê xistin bin hukmekî.

Bi biryara lijneya wezîran zêdekirina nîspeta bacan divê ji pêkaniyê bê deranîn, zêdekirina nîspeta bacan bi awayê ku bi tenê bi biryara parlementoyê be bê xistin bin hukmekî makezagonî.

Di beşa ku pênasa hemwelatiyê û maf û azadiyên bingehî tên sererastkirin de divê cî bê dayîn madde an jî fiqreyeke bi vî awayî: "Peyde kirina îstîfadeya hemî hemwelatiyên Komara Tirkiyê bi awayekî wekhev ji van mafan erk û berpirsiyariya dewletê ye û sedemê meşrûiyet û hebûna wê ye." Bi vî awayî hem wê gengeşiyên di derbarê pênasa hemwelatîtiyê de bi dawî bibin, hem jî wê bi hêz li ser maf û azadiyan hatibe sekinandin.

## 2 - NÊRÎNA LI ERKEDARÊN GIŞTÎ Û HEMWELATIYAN

Erkedarên giştî; ew xizmetkar in ku me'aşê wan ji aliyê hemwelatiyan ve tê dayîn û ji bo rêvebirina xizmetên giştî yên ku bi bacên hemwelatiya tên fînanse kirin hatine erkedarkirin. Bi pênaseke dinê ne Xwedyê hemwelatiya ne ku li ser wan hikum dikin, xizmetkarên wan ên di xizmeta wan de ne. Di miqabil vê de civakên hemwelatiyan ne keriyên ku ji aliyê erkedarên giştî ve têne çêrandin û îdarekirin in, efendîyên wisa ne ku divê xizmeta wan bê kirin.

## 3 - KÊŞEYA KURD

Ji gelên herî kevnare yê Rojhilata Navîn, Kurd, navê gelekî ye ku bi Kurdî diaxifin û bi piranî li ser merkeza erdnîgariya bi navê Kurdistan ku li rojhilat ji çiyayên

Zagros, li rojava bi bal rojhilatê çiyayên Torosê, li Bakur ji başûrê çiyayên Deryaya Reş bi bal başûrê rojhilat ve nêzîkî bakurê Kendava Besrayê dirêj dibe û ji bakurê rojhilat dighê heta nava Qafqasya, ji başûrê rojava heta xetta bakur a Helebê ye.

Kurd, di herêma ku lê dijîn ji gelên herî kevn in. Pey Sedsala Yazdehemîn (11) bi hatina Tirkan bi bal vê herêmê ve di navbera wan de bi ola Îslamê têkilî û nêzîkbûn çêbûye û li hember hêzên Bîzansiyan yên li herêmê bi hev re têkoşîn kirine. Di dewrên pey de jî bi sedsalan li ser van axan bi hev re bi biratî jiyane. Lê belê bi kiryarên di pey re ku derketine holê, kiryarên "Îttîhat û Teraqqî"yê û di dema dawî de pey damezrandinê kiryarên komarê, ev biratî dest bi xirabûnê kiriye.

Îdeolojiya komarê, bi awayê bingehî li ser du prensîban hatiye damezrandin. Yek ji vana 'elmaniyet/sekulerism e, a din jî Tirkîtî ye. Ji ber tetbîqat û guherînên girêdayî bi laîktiyê ve; Kurdan, digel birayên xwe Tirkên Musulman yên li rojava gelek te'de û pirsgirêk dîtin. Lê belê te'de û pirsgirêkên dîtine ne ev bi tenê ne. Ji bilî vê, ji ber ku Kurd bûn jî di encama polîtîkayên asîmîle û hewlên Tirkkirinê de gelek te'de û kêşe dîtine. Bi vî awayî hem ji ber tezyîqatên laîktî û hem jî ji ber tezyîqatên Tirktiyê Serhildana Şêx Se'îd, Dêrsim û Agiriyê bi tundiyeke mezin û komkujiyan hat tefandin, digel vana di komkujiyên wek a Geliyê Zîlanê de bi sed hezaran Kurd hatine kuştin, birîndar bûn û hê ji vana jî zêdetir gelekên wan birçî û tazî hatine nefî kirin. Zilm û wehşeta di wê demê de hatiye kirin giha rewşeke ku êdî hiş hilnagire.

Ji bo ku aşîtiya civakî û rewşa adetî bê temînkirin;

Di serî de divê ji ber zilmên ku heta îro hatine kirin, pêwîst e ji alî dewletê ve lêborîn bê xwestin û ji mexdûran re tezmînat bê dayîn.

Pêwîst e Tirk danasandina herkesên ku bi girêdana hemwelatîtiyê bi Komara Tirkiyê ve girêdayî ye bê terikandin û hebûna Kurdan bi makezagonê bê naskirin û Tirk û Kurd wek damezrînerên 'eslî yên welêt bên pejirandin.

Pêwîst e Kurdî, bi zimanê Tirkî re wek zimanê fermî yê duyemîn bê pejirandin, di heman demê de Kurdî bibe zimanê perwerdehiyê. Heger ku xwesteka kafî hebe, divê pêşiya perwerdehiyê li hemwelatiyên bi zimanekî cuda a zikmakî dipeyivin bê vekirin.

Pêwîst e metnên wek "Andimiz/Sonda Me" yên bi xwendekarên mekteban didin xwendin û bêhna nijadperestiyê ji wan tê, bên rakirin. Nivîsên: "Ne mutlu Turkum Diyene / Bextewar e yê bêje ez Tirk im" ku li deverên cuda têne nivîsandin bên rakirin û dawî bê dayîn peyvên wek: "Bir Turk dunyaya bedeldir/ Tirkek berdêlî dinyayê ye ."

Pêwîst e navê mekteb, wargehên leşkerî, kolan û cihên wek vana yên ku navê kesayetên zalim hatiye dayîn, bi lez bên guhartin.

Pêwîst e di serî de bilêvkirinên heramker û cudaker yên di tarîfa hemwelatiyê, makezagon û hakimê tevî lîteratora fermî a bi bingeha Tirkîtiyê bên terikandin.

Cî û warên ku navên wan hatine guhartin pêwîst e ji nû ve navê wan yê berê bê dayîn.

Sîstema qorîcîtiyê/cerdevaniyê a ku li herêmê dibe sedemê gelek pirsgirêkan divê bi lez bê rakirin, lê belê digel vê yekê pêwîst e dewlet nebe sedemê hinek mexdûriyetên cuda.

Pêwîst e 'aqibeta kesên winda yên ku hejmara wan bi hezaran e bê daxuyandin, lêpirsînin di derbarê cînayet û kuştinên fa'ilên wan nayên zanîn bi ciddiyet bên meşandin û berpirsiyarê van cînayetan bên dîtin û cezakirin.

Pêwîst e hesabê şewitandina gundan û koça bi zorê bê pirsîn. Divê bêhiqûqiyên ku Ergenekon, JÎTEM û saziyên weke vana li herêmê kirine, bi awayekî berfireh bên lêpirsîn.

Pêwîst e bi awayê fermî bê qebûl kirin ku, di serî de Şêx Se'îd, li 'alimên Kurd yên Kurd rêza wan digrin zilm hatiye kirin û divê ji malbatên wan û hemî gel lêborîn bê xwestin.

Pêwîst e ciyê mezargehê kesayetên wek Se'îdê Nûrsî, Şêx Se'îd û Seyyîd Riza bên eşkerekirin û arşîvên di derbarê dadgehên Îstîqlalê de bi lez bên vekirin.

Pêwîst e medrese bên zindî kirin, bên gihîştandin fonksiyona xwe ya esasî û statuya fermî bê dayîn destûrnameyên li medreseyan tên dayîn.

Ji bo herêma ku salên dûve dirêj e li paş hatiye hiştin bighêje refaha aborî a li rojava divê xewan bên kirin, di vê wateyê de divê herêm bi awayekî pozîtîf ji herêmên din cuda bê girtin.

Rehetî û îmtiyazên ku ji Tirkên Trakya Rojava û ji herêmên din yên Tirkan re di dema dixwazin bibin hemwelatiyê Tirkiye tên nîşandan divê ji Kurdên ne hemwelatî re jî bên nîşandan.

Pêwîst e ji bo kesên ku ji ber sedemên siyasî hatine xistin bin şopandinê an jî ji ber cezayên girtine reviyane derveyê welat û ji bo kesên ku ji ber ramanên xwe yên siyasî hatine xistin girtîgehan vegerin jiyana civakî 'efweke siyasî bê deranîn.

Pêwîst e desthilatdariya tund a navendvan bê bidawîkirin û îdareyên mehellî bên bi hêzkirin û hemî îdarevanên mehellî ji alî gel ve bên hilbijartin.

Van gavan dê biratiya navbera herdû gelan zexmtir bike û ji bo ku welat ji her alî ve bi pêşkeve dê sînerji-

yeke mezin çêbike. Ji xwe dîrokê nîşan daye ku polîtîkayên tezyîqat, înkar û asîmîlasyonê yên ku gelekî bi hêza dewletê li gelekî din kiriye ji bilî xwînê, jan û hêstirên çavan tiştekî din neaniye.  Bi tenê yekîtiya ji dil û bi îradeya hevpar a du gelên ku hev qebûl dikin û rêz nîşanî hebûna hevûdin didin her demî bi xwe re refaha maddî û me'newî aniye.

Em kesên bi dilsozî baweriya me bi biratiya gelên li ser vî welatî dijîn heye, ji bo refah û dilşadiya van gelan û biratiya wan zexm bibe bawer dikin ku van gavên li jor me jimartin pêwîst e bi lez bên avêtin.

## 4 - BIHÊZKIRINA RÊVEBERIYÊN MEHELLÎ Û RÊVEBERIYÊN JI CIYÊ WÊ

Ji damezrandina Komara Tirkiyê ta niha, bi zordariya zihniyeta yek tîp, pir zimanî û pir çandiya ku ji bo welêt dewlemendî ye, guheriye bi bal bûyîna sedemê şerê etnîkî û çandî. Israra li ser rêveberiya navendî a ku weke mamûlê vê zîhniyetê derketiye rastê di welat de bûye sedemê gelek pirsgirêkan.

Rêveberiya navendî, ji ber ku giran e û ji ber ku pirsgirêkên her herêmê û fêmên wan cuda ne, çareserkirina van pirsgirêkan ji navendekê bi tenê bi awayê ku herkes razî bibe zehmet e.

Ji bo ku van ziyanên ku rêveberiya navendî a hişk bûye sedem ji holê bên rakirin divê rêveberiyên navendî û bi tayebetî jî şarederiyên ku ji cîheta karkirinê de gelek girîngiya wan heye divê bi rayên berfireh ji nû ve bên sererastkirin.

Ji rêveberiyên mehellî re, ji aliyê çêkirina çavkaniyan û bi destxistina hatiniyan de divê nermtir bê mi'amele kirin.

Ji bo ku beşdariya plan û pêvajoyên biryaran yên ku bi rêveberiyên mehellî re 'eleqedar in bê temînkirin, di

çêkirina biryarên ku rêveberiya navendî girtiye de divê fikr û ramanên wan jî bê sitendin û di sererastkirinên dê bên kirin de divê mafê ku li hember van biryara karibin herin dadgehiyê bê dayîn rêveberiyên mehellî.

Divê wesayeta rêveberiya navendî a li ser rêveberiyên mehellî bê rakirin, di şûna vê de divê hevkariya beramber bê temîn kirin û mekanîzmayên kontrolê yên navxwe bên aktîve kirin.

Kontrola rêveberiya navendî a li ser şarederiyan; divê bi awayê ku zirarê nede xwesertiya şarederiya, bi hevgirtî û bi tenê kontrol di derbarê minasibtiya li gor makezagon an zagonan e bê kirin. Divê kontrol ne kontrola ji ciyê xwe be.

Rêveberiya navendî bi awayê dembihûrekî be jî divê nikaribe wezîfa rêveberekî hatiye hilbijartin bi dawî bike û wî ji erka wî dûr bike. Dîsa biryarên ji aliyê meclisên mehellî (meclîsa şaredariyê, meclîsa bajar a giştî) ve tên sitendin divê ji bin şertê tesdîqa rêveberiya navendî bên deranîn.

Digel dewra beşek rayên rêveberiyê bi bal rêveberiyên mehellî ve, divê beşdariya gelê herêmê ji rêveberiyê re bê zêde kirin, di biryarên dê di derbarê herêma wan de bê sitendin de divê xwedî mafê peyvê bin. Bi vî awayî wê randimana xizmetan zêde bibe, rê li îsrafê bê girtin û bi saziya xweser a ku dê çêbibe dê wesayeta rêveberiya navendî dê bê şikandin.

Digel sererastkirina organîzasyona rêxistina dewletê a navendî û mehellî, ji pejirandina wek tabûyekê a rêxistina vêga jî divê bê terikandin û bi hemî aliyên wan yên erênî û neyînî li ser modelên rêveberiyê yên weke sîstema eyaletê, xweserîtî û federasyonê divê bi serbestî nîqaş bê kirin. Dema ku ji bo aramî, geşdarî û ewlehiyê ji aliyê piraniya civakê ve bê pejirandin divê pêkanîna van modelan tiştekî pêkan be.

## 5 - KÊMJIMARÊN NÎJADÎ Û OLÎ, PÊŞÎLÊGIRTINA NÎJADPERESTIYÊ Û CIYAWAZIYÊ

Li ber dadê herkes wek hev e. Li pêşberê destûr û zagonan îmtiyaza tu kesî û aliyî nayê pejirandin.

Di dana xizmetên raya giştî de ciyawazî û îmtiyaz nabe ku bê kirin. Dewlet, ji ber nîjad, reh, ol, mezheb, ziman û bi sedemên wek vana nikare ciyawaziyê bike.

Ciyawaziya di aliyê aborî, dadî û reveberiyê de divê bê xistin binî mueyyîdeyên cezayî

Baweriya kêmjimarên olî, pêwîst e bê xistin binî ewlehiya makezagonê.

## 6 - ZELALKIRINA XIZMETÊN RAYA GIŞTÎ, NEQANÛNÎ Û TÊKOŞÎNA LI HEMBER BEDKARIYAN

Tiştê ku em ji prensîba eşkeretî û zelaliyê fêm dikin ev e ku; rêveberên raya giştî, tevgerên rêveberiyê li ber çavê gel eşkere bimeşînin.

Kirina xizmetan bi awayê eşkere û zelal, ji pêdiviya mafê hesab pirsîna gel ji rêveberan û bikaranîna vî mafî bi awayekî rast û di dema wê de ye. Di hêla din de di dema wê de û bi awayekî rast agahdarbûn mafekî hemwelatîtiyê ye. Ji ber van sedeman divê xizmetên raya giştî zelal bên kirin, kontrola gel li ser hemî xizmetan û rêvebirina wan pêwîst e bê bidestxistin, her hemwelatiyê ku têkildar e di derheqê mijara ku dixwaze de divê karibe agahiyan wergire û saziyên dewletê bi navberên periyodîk divê agahiyan bi gel re parvekin.

Rêya herî bi bandor ji bo pêşkêşkirina xizmetan bi awayekî rast û di dema wê de, pêşîlêgirtina bedkariyan û neqanûniyan û pêşîlêgirtina îsrafa çavkaniyan; zelalî û agahdarkirina rast ji hemwelatiyan re teqez divê bê temîn kirin.

Ne tiştekî pêkan e ku bê gotin; heta îro bi awayê siyasî û burokratîk xizmetên raya giştî çawa tê xwestin zelal û eşkere hatine dayîn û bi awayê divê li hember neqanûniyan têkoşîn hatiye kirin.

Lewra dereceya Tirkiyê a di têgihîna neqanûniyan, a Rêxistina Zelaliyê a Navneteweyî de vêya qenc nîşan dide. Ev rewş jî tîne holê ku divê sedem û encamên neqanûniyan li welatê me qenc bên lêkolîn û nirxandin û ji bo têkoşîna li hemberê metod û çareseriyên aktîf bên îhdas kirin.

Ji bo têkoşîna li hember neqanûnî û bedkariyan çêkirina civakeke bi exlaq; ji bo dereceya exlaqî a civakê jî bê bilind kirin pêwîst e ku sîstema perwerdehiyê bi bingeha exlaqê ji nû ve pê avakirin.

## 7 - ÇAND Û DÎROK

Heger ku em civakê bişibihînin darekê dîrok, di şûna rehê wê darê de ye. Dareke ku rehê wê hatine birîn an jî ew ji rehên xwe hatiye qut kirin ne tiştekî pêkan e ku li ser piya bimîne û jiyana xwe bidomîne. Pêwîst e zordariya dîroka îdeolojîk a fermî ku dibe sedemê civak ji rehên xwe bê birîn bê terikandin. Dîrok; divê bi awayekî reel, objektîf û berfireh bê nivîsandin, di pirtûkên dersan de bi awayekî resen cî bigre û li gor vê sûret bê dayîn bîra civakê.

Çanda Îslamê; çandeke ku tê de ‘eql bi neqlê re, exlaq bi hunerê re, zanîn bi lêkolînê û pratîkê re bûye yek. Ew çandek e ku, tecrûbeyên ummetekê, komasiyên wê yên dîrokî û xulaseyên fe’eliyetên wê ye. Çanda Îslamê, çandek e wisa ye ku ji mercên rûhî, xezîneyên dîrokî û ji hêviyên wê yên ji pêşeroja wê çêbûye. Sirra berdewamî û sparteka hebûna ummeta şaristaniyê û ummeta xêrtirîn ku ji nav mirovan hatiye deranîn di vê çandê de veşartiye.

Pêwîst e mîrata me ya çandî ku hempayî ya hevkar a tevî sinif û komên ku civakê çêdikin e bê parastin û gihîştandina vê mîratê ji neslên bê re bê peydekirin.

Pêwîst e pêşiya ku xort ji çanda xwe re xerîb bimînin û bi vî awayî xirabibin bê girtin, ji bo ku girîngiyên me'newî bêne hezkirin, xwedî derketin û gihîştandina wan ji neslên bên re polîtîka bên çêkirin.

Pêwîst e pêşî li ser navê Turîzm û popularîteyê, gerandina medrese, dêr û 'îbadetxaneyên me yên ku ji mîrata me ya çandî ne, weke mekanê fe'eliyetên ne exlaqî ku bi mîsyon û pîroziya wan re li hev nayê, bê girtin.

## 8 - PARASTINA HAWÎRDOR Û SIRÛŞTÊ

Gerdûn li ser mîzên û întîzamekê hatiye afirandin. Hemî hebûnên candar û ne candar xwedî fonksiyona temamkirin û sererastkirina hevûdin in.

Dewamiya jiyana mirovan, bi mêzîna di jiyanê de pêkan e. Teserrûfatên bê mêzîn yên mirovan ku texrîp û dixeritîne, hatiye asteke wisa ku êdî gefan li jiyana candarên din dike.

Mirovahiyet, mêzîna sirûştî a ku ji bo jiyanê pêwîst e, ji pêşiyên xwe bi awayê mîratê na ji neslên pêşerojê bi awayekî emanet wergirtiye. Divê pêşî lê bê girtin ku, di encama senayîbûnê de avêtiyên kîmyewî û biyolojîk zirarê nedin hawîrdor, bi zanedar kirin û cezayên giran mêzîna sirûştiyê û hawîrdor bê parastin.

Divê dewlet dev ji pêşbaziya sîlehan berdin û ji bo qedexekirina sîlehên kîmyewî bi sazî û rêxistinên navneteweyî re hevkariyeke aktîf bê pêşxistin.

# D - EKONOMÎ

## 1 - DESTPÊK

Kapîtalîzm; berhema çandeke ku berjewendiyê dike peyker, berjewendiya kesayetî dike îlah, wehşî û bê ujdan e. Sîstema Kapîtalîst a ekonomîk ku îro li gelek dewletên dinyê û li welatê me tê tetbîq kirin, beşeke malbata mirovahiyetê kiriye mehkûmê feqîriyê hetta kiriye mehkûmê birçîbûnê.

Li Dewleteke mîna Emerîka ku ekonomiya dinyê a herî mezin di dest wê de ye, bi milyonan mirov li kolanan radizên. Ev yek derdixe holê ku ev sîstem ne însanî ye û nabe bê domandin.

Ji aliyekî ve mirov li hember birçîbûnê têkoşînê didin, ji aliyê din ve kesên çavbirçî û azwer, çavkaniyên ser û binê erdê yên dinyê diqedînin û dibin sedemê ku gelek celebên candaran winda bibin, sirûşt texrîb bibe, hawîrdor û mehwa qirêj bibe.

Em nêrîneke ekonomîk a ku di navenda wê de mirovahiyet nîne, ji amanca belavkirina refahê ji tevî civakê re dûrketiye, bi tenê berê xwe daye ku ekonomiya welat mezin bibe red dikin. Heger ku Hasilaya Millî A Ne Safî sed qat jî zêde bibe, heger ku di hejmara feqîr û birçiyan de kêmasî çênebûbe, ev mezinbûna ekonomîk ji bo birçî û feqîran nayê tu wateyê. Ya girîng ew e ku bê ‘edaletiya di belavkirina hatiniyan de ji holê bê rakirin û refah di nav hemî gel de bê belavkirin. An na dema ku aliyên dereceya wan a ekonomîk bilind e; mafên feqîran, çavkaniyên ser û binê erdê û sirûştiyê xesp dikin de dê bi tenê temaşevantî bê kirin.

Divê polîtîkayeke aborî a ku di navenda wê de mirovahiyet heye, bilindkirina dereceya refaha mirov

dike amanc û ji nêrînên lapetî yên kapîtalîst û sosyalîst dûr, ujdanan û hissiyeta ‘edaletê neêşîne bê tetbîq kirin.

Heger amanca bingehî a polîtîkaya ekonomiyê mirov be; divê wê demê amanca mezinbûna aborî jî zêdekirina îstîxdamê û daxistina bêkariyê bi bal asta herî nizim ve be. Ji bo ku mezinbûn û îstîxdam dewamî be divê di vê derbarê de polîtîkayên ku pêkan e bên domandin bên tetbîq kirin.

Pêwîst e amanca yekem a polîtîkayên teşwîq û îxracatê jî zêdekirina îstîxdamê be. Teşebbusên ku wê bi teşwîqan piştgiriya wan bê kirin, divê ewil li herêmên ku bêkarîtî pir e li gorî zêdekirina îstîxdamê bên kirin. Ji sektorên ku pirtir keda însan divê re divê piştgir û teşwîq pirtir bê kirin.

Ji bo îmal kirina berhem, mal û xizmetên ku xwedî girîngiya stratejîk in, divê pirtir teşwîq bê kirin. Ji bo ku malên hilberîn yên ku di her sehayên jiyanê de pêdivî bi wan heye bi îmkanên mehellî bên îmal kirin divê tedbîr bêne sitendin. Welat, hem ji aliyê endustriyê ve, hem jî ji aliyê çandiniyê ve divê ji girêdana dewletên derve xilasbibe.

Ji bingehên polîtîkayên ekonomiyê yek jî kêm kirina kesên bêkar û mirovên bê taybetmendî ye. Ji ber vê yekê divê qursên ku mirovan hînê meslekê dikin bên zêdekirin, bi taybetî divê karkerên bê taybetmendî ji bo bibin xwediyê meslek û hunerekê îmkan bên çêkirin.

Kesên xwedî huner û meslek ku bê kar in, ji bo karibin meslek û hunera xwe pêkbînin pêdiviya wan bi çi alav, amûr û xebatgehê heye di vê derbarê de divê alîkariya wan bê kirin.

Baweriya me ew e ku, heger li ciyekî dinyê yekî ku muhtacê luqmeyek nan hebe, bêguman di heman dinyê

de hinek kesên ku zêdeyê hewcedariya xwe dixwin û vedişêrin jî hene. Lewra nî'metên li ser dinyê ne bi tenê ji bo ku têrî mirovan bikin, bi qasî ku têrî candarên din jî bikin hene. Weke ku teoriya ekonomîk a kapîtalîst wek rastiyeke teqez dibîne "îhtiyac bê sînor û çavkanî bi sînor" nîn e. Yê ku bê sînor e ne pêdivî, dibe ku îhtîrasên kapîtalîstan bin.

Li gor ramana dinya a kapîtalîst mêzîna azadî û kêfxweşiyê xeritandin e. Amanca wan a ku bi peyvên weke: "Tu çi divê ku karibî bixeritînî, wê demê tu azad î. Tu çiqas karibî bibel'înî û bixeritînî wê demê tê yê ewqas kêfxweş bibî..." guherandina civakê bi bal civaka xeritandinê ve ye, ji bo pirtir karibin pereyan bidestbixin teşwîq û tehrîk kirina zêdetir e. Hal ev e yên ku bi hindikî qayîl nebin, bi pirî jî kêfxweş nabin.

Mêzîna herî girîng ji bo ka polîtîkayên ekonomiyê yên tên tetbîq kirin navenda wan mirov e an na, awayê parvekirina girîngiyên hatine îmal kirin e. Sîstema kapîtalîst ku para şêr dide sermiyan û sîstema sosyalîst ku kedê dixe pêşiya her tiştî sîstemên mufrît in. Sîstema Qomunîst a ku pêdiviyê dike esas jî ne li gor realîteya jiyan û afirîşê ye.

Bidestxistina azadiya ekonomîk a welat, mihûkirina mehrûmiyet û feqîriyê ji rehê wê ve û ji bo pêdiviyên mirovan bi parastina azadiya wan bê bidestxistin, teqez divê sîstemên ekonomîk yên ku li hember afirîş û girîngiyên mirovahiyetê ne bên terikandin. Fîkriyata Qomunîzmê a ku li hember van giringiyan e, digel felsefe û sîstema xwe îflas kiriye. Sîstema kapîtalîst jî wê di demeke nêz de îflas bike. Ji vî aliyî ve, van sîstemên ku ji mirovahiyetê re aramî û refahê neanîne divê ji rehê xwe ve bên guherandin û di şûna wan de nîzam û sîstema ekonomîk a Îslamê bê anîn.

Pêwîst e qîmeta xwêdana eniyê bê zanîn û berdêla wê berya ew xwêdan ziwa bibe bê dayîn. Dema berdêla xwêdana eniyê hat dayîn divê neyartiya sermiyan jî neyê kirin, mehrûmên ku sermiyan û karê wan nîne jî ji birçîbûn û sefaletê re neyên terikandin. Divê sermiyan ji rewşeke ku bi tenê di navbera dewlemendan de digere bê deranîn, rêya navînî ev e.

## 2 - POLÎTÎKAYA ME A EKONOMIYÊ

Sîstema ekonomiyê a li ser faîzê li piya dimîne divê bi temamî bê rakirin.

Hem gel, hem bankavanî an jî di deynên ferdî de nêrîna bi bingehiya faîzê divê nîn be.

Pêwîst e dewlet ji kesên ucreta herîkêm distînin bacê nestîne, pêdiviyên bingehî jî divê ji bacan bên safî kirin. Di "Rêziknameya Ucreta Herî Kêm" a hejmara wê 25540'ê de ucreta herî kêm bi vî awayî te danasandin: "Ucreta herî kêm ew ucret e ku; di miqabilê karê rojekê de tê dayîn kesê karker ku pêkan e pê dikaribe di dereceya herî kêm de pêdiviyên xwe yên zerûrî weke xida, cil, tenduristî, gihanî û çandê pêkbîne." Divê ev wateya ku ucreta herî kêm bê guhertin û li vê wateyê malbata karker jî bê zêdekirin.

Divê perwerdehî û tenduristî bê ucret be, dîsa divê feqîrên ku nikarin pêdiviyên xwe yên xwarin û hewandinê bicî bînin, van pêdiviyên wan yên zerûrî jî ji alî dewletê ve bên pêkanîn. Ji bo kesên ku hatine temenê zewacê, zewac jî pêdiviyek e. Ji ber vê yekê divê ji kesên ku ji feqîrtiyê nikarin bizewicin re îmkan bên çêkirin.

Pêwîst e ji bo kesên ku di dereceya herî kêm a feqîrtiyê de ne, ji her nefsekî malbata wan re li gor mîqdarê ku di qanûnê de bê tespît kirin pêdiviyên wek av, ceryan û gazê belaş be.

“Ji bo mirov berdêla karê kiriye heye.” Çawa ku ji vê peyvê jî tê fêmkirin deriyê bingehî a bidestxistina mal ked e. Di vê wateyê de di derbarê mafê xebatê a jin û mêr de tu cudahî nîne.   Lê belê ev heye ku; dema ciyê jin û mêr a di malbatê de û taybetiyên wan yên fîzyolojîk tê dayîn ber çava, divê li gor cî û taybetiyên wan sehayên kar ji wan re bên dîtin an amade kirin. Digel vê yekê em bawer dikin ku wezîfa nihêrtina li malbatê karê mêr e, ji bo pîrekê divê ciyê kar yê pêşî mala wê be.

## 3 - TÊKOŞÎNA LI HEMBER FEQÎRTIYÊ – PARVEKIRINA DAHATIYAN

Yek ji amancên dewleta civakî, xilaskirina civakê û mirovan ji feqîrtiyê û ji bo mirovê şereftirînê afirîneran e amadekirina merc û nêvengan. Di têkoşîna li hember feqîrtiyê de amanca bingehî ew e ku: ji bo jiyaneke bi mirovahî herî kêm bidestxistina dahatiyeke ku pê dikaribe pêdiviyên xwe yên zerûrî pêkbîne.

Bê’edaletî ya di belavkirina dahatiyên de, hatiye dereceyeke wisa dibe ku bibe sedemê teqînên civakî. Lê belê ev heye; piştevaniya nav malbatî, zekat, sedeqe, înfaq û fe’eliyetên alîkariyê yên weqif, komele û saziyên olî û rewşa civakî a bi cî bûye, pêşî li teqîneke wisa digre.

Hema hema nîvê dahatiyên welat, kesên dewlemend ku ji % 20’ê civakê ew in ji xwe re distînin. Ev kesên ku di koma kesên dahatiyên wan yên herî zêde de ne, para herî mezin ew digrin. Ji % 80’êyê civakê jî nivê din yên dahatiyên welat distînin.

Ji %20’ê civakê ku di dereceya herî feqîr de ne di nav birçîbûnê de, ji % 20’ê civakê ku di dereceya duyemîn a feqîriyê de ne jî di nav xizaniyê de ne. Kesên ku di sînorê xizanî û birçîbûnê de dema ku tê dayîn ber çava ku di hinek herêman de kom bûne, dereceya bê ‘edaletiyê hê bêtir mezin dibe.

Ev tewşobûn divê bi lez bê rakirin. Ji bo vê yekê divê Tirkiye, stratejiyên xwe yên pêşveçûn û endustrîbûnê teqez biguherîne. Divê newalên di navbera aliyên herî feqîr yên civakê û aliyên herî dewlemend yên civakê bi lez bên dagirtin, cudahiya di navbera wan de bê anîn asteke maqûl.

## 4 - HERÊMÊN JI ALIYÊ EKONOMÎK VE LI PAŞ MANE

Pêşketina ekonomîk û civakî a Rojhilat, Rojhilata başûr, Rojhilata Karadenîz û Anatoliya Navîn, ji destpêka komarê ve hatiye îhmal kirin û çavkaniyên ekonomîk yên van herêman hatine heba kirin. Ev rewş, bûye sedemê ku pirsgirêkên aborî û civakî yên van herêman bighîjin asteke wisa ku ne pêkane bên çareserkirin.

Digel hemî qanûnên teşwîqê jî, ji Rojhilat û Rojhilata başûr re bi awayê divê plasman nehatiye kirin, ji ber vê yekê jî gelek eşkere ye ku nîsbeta bêkariyê a li van herêman gelek bi ser nîsbeta Tirkiyê de ye. Yên ku welat îdare dikin jî dibêjin: sedemê vê yekê ze'fiyeta ewlehiyê û bûyerên tundîtiyê ne û bi vî awayî dixwazin xwe ji berpirsiyariyê xilasbikin. Rast e sermiyan, ji herêmên ku ewlehî û îstîqrar nîn be direve. Lê belê kesên ku wezîfedar in ewlehî û îstîqrarê temîn bikin, di şûna ku qelsbûna ewlehiyê wek qisûreke xwe bibînin, radibin ji bo qisûreka xwe ya din wek bêkarî û li paş man a van herêman me'zeret nîşan didin. Ev ji cambaztiya peyvan pê ve ne tiştekî din e.

Dewlet û yên ku wê birêvedibin, beriya her tiştî wezîfa wan ew e ku, ewlehiya mal û canê hemwelatiyên xwe temîn bikin û pey re jî ji wan re kar û aş temîn bikin.

Di serî de Rojhilat û Rojhilata başûr, li hember herêmên ku li paş mane divê planên pêşketina herêmî yên bi taybet bên tetbîqkirin. Dewlet, li herêm û

sehayên ku sektorên bi taybet nakevinê de, ew bi xwe divê plasmanan bike û ji hemwelatiyên xwe re ciyên kar çêke. Van herêman xwedî îmkanên berfireh in ji bo xweyîkirina heywanan û zîre'etê. Petrol, bi tenê ji van herêman tê deranîn.

Tesîsên endustriyê yên ku pişta xwe dane zîre'etê, endustriya petrokimya û tesîsên goşt û masiyan divê ji alî dewletê ve bên sazkirin û ji pêşveçûn û endustrîbûna herêmê re pêşîvanî bê kirin. Divê piştgiriya seravaniyê bê kirin, di derbarê proje û plasmanan de xizmetên şêwirmendiyê bê û kredî bên dayîn.

Divê giranî bê dayîn ser projeyên wek Projeya Pêşvebirina Rojhilata başûr û Projeya Pêşvebirina Rojhilat û bi lez ev proje bên temam kirin û temam kirina van projeyan wek plana 'acîl a kar bê tespît kirin.

Di bendên li ser çemên Dîcle û Feratê de divê hilberana masiyan bê teşwîq kirin.

Digel ku Rojhilat û Rojhilata başûr, xwedî potansiyeleke mezin e di bazirganiya sînor de, pêşî li îstîfadekirina ji vê potansiyelê hatiye girtin. Divê li herêmên li sînorê 'Iraq, Îran û Sûriye herêmên ji bazirganiyê re serbest bên damezrandin, ji bo zêdekirina bazirganiya sînor pêwîst e deriyên nû werin vekirin û çawa bê pasaport çûna Qibris û Gurcîstanê serbest e, divê li van herêmên din jî ev yek serbest be.

## 5 - MÊZÎNA ÎTXALAT Û ÎXRACATÊ – MALIYETÊN HILBERANÊ

Di endustriyê de ketana herî girîng enerjî ye. Xistina maliyeta enerjiyê dê maliyeta îmala endustriyê daxîne û dê îmkana îmalata erzantir û kalîtetir çêbike. Bi vî awayî dê hêza reqabetê a hilberana mehellî di piyaseyên derve de zêdetir bibe.  Ev jî tê wê wateyê ku îxracat

zêdebibe, û mîzêna îtxalat û îxracatê di leha welat de biguhere û bêkarî kêm bibe. Ji ber vê yekê pêwîst e maliyeta enerjiyê bê daxistin û girêdana di vê derbarê de bê daxistin asta herî kêm.

## 6 - MALIYETÊN ENERJIYÊ – ENERJIYA NUKLEER

Divê santralên hîdroelektrîk bên avakirin, santralên enerjiya nukleer bên damezrandin.

Divê projeyên dê bibin wasîte ku ji enerjiya ba û tavê bi awayê herî zêde bê îstîfade kirin bên bipêşxistin.

Ji bo pêşî li windabûn û îsrafa enerjiyê bê girtin binavayî, divê bê deranîn asta standardên navneteweyî.

Divê lêgerînên petrol û gaza xwezaî zêdetir bêne kirin, ji bo vê yekê pirtir budçe bê texsîs kirin. Rezervên petrolê yên hatine dîtin divê çêtir bên bi qîmet kirin.

## 7 - ZÎRE'ET Û AJALDARÎ / XWEDÎKIRINA HEYWANAN

Ji bo gelekî dikaribe bi xwe têrî xwe bike, zîre'et xwediyê girîngiyeke stratejîk e. Di mamulên zîre'etê de pêşîlêgirtina girêdana ji welatên derve re xwedî girîngiyeke jiyanî ye. Ji ber vê yekê divê weke xezîneyekê qîmeta cotkaran bê girtin û bên parastin.

Makîne û ekîpmanên di hilberana zîra'î de tên bikaranîn divê bi temamî mehellî bin û bi vî awayî pêwîst e maliyeta wan bê daxistin û belavkirin.

Kanalên avdanê yên avakirina wan nîvî mane divê bi lez avakirina wan bê qedandin, mîqdara 'eraziyên ku avdana wan pêkan e bên zêdekirin û bi lez av bê gihîştandin 'erdê.

Ji bo avdaneke bi şi'ûr divê cotkar bêne ronîkirin û bi rê û dirbên avdanê yên modern divê pêşî lêbê girtin ku 'erd bajî bibe.

Ji bo zêdekirina hilberana zîra'î û zêdekirina kalîteya wê divê ji her gundekî re muhendîsekî zîre'etê û heger xwedîkirina heywanan hebe beytarek bê te'yîn kirin.

Ji bo mehsûlên cotkaran di destê wan de nemîne û di binya maliyeta xwe de neyê firotin, pêwîst e endustriya li ser zîre'etê bê teşwîq kirin, ji bo mamûlên zêdeyê pêdiviyê bên îxraç kirin divê piştgiriya teşebbusên têne kirin bê kirin.

'Erdên ji bo zîre'etê bi bereket in, ji bo amancên ne zîra'î ne, tên heba kirin. Divê pêşî li karanîna 'eraziyên ji bo zîra'etê baş in di amancên wek bajarbûn û endustrîbûnê de bê girtin.

Pêwîst e piştgiriya xwedî kirina heywanan bê kirin û saziyên goşt û masî û endustriya şîr û êm li hemî herêman bên xistin fe'eliyetê.

Divê ji bo kesên cotkarî û xwedîkirina heywanan dikin bibin kooperatîf teşwîq bê kirin, ji bo ku mamûlên keda wan e bê navbervan dikaribin bigihîjînin muşteriyan divê mercên pêwist e bên amadekirin.

Ji bo zêdekirina îmalatê û di tov de girêdana ji welatên der ve re nebe, divê girîngî bê dayîn sererastkirina tovan, divê sererastkirinên zagonî çibin bên kirin û destek bê dayîn kesên bi vî karî ve mijûl in.

Divê girîngiyeke bi taybet bê dayîn pêşvebirina xwedîkirina heywanan û divê ji bo zêdekirin û firotina mamûlên avê yên ku ji derya û çavkaniyên avê yên navxwe tên bidestxistin destek bê dayîn mustehsîlan.

Divê ji bo ku li Rojhilat xwedîkirina heywanan, li Rojhilata başûr zîre'et, li Karadenizê daristanî û masîvanî bi pêşkeve projeyên bi taybet bên amadekirin, masîvaniya deryayên vekirî û di pengava de çewlikên masîyan bên teşwîq kirin.

## 8 - VEGERA BI BAL GUNDAN VE Û PÊŞVEBIRINA GUNDIYAN

Ji bo vegera bibal gundên ku hatine valakirin an terikandin bê temînkirin û van gundan jî tevlî hilberanê bibin teşwîqên ku têne kirin divê bêne zêdekirin.

Ji bo cotkarên ku erdê wan nîne an jî erdê wan hindike dikaribin debara xwe bikin, divê reformeke erd a berfireh bê kirin û cotkarên ku erdê wan nîne an jî hindike divê bi vî awayî erd bê dayîn wan.

Divê li her ciyên welat analîzên axê bên kirin, di kîjan 'eraziyê de kîjan mehsûl çêtire ku bê çandin bi vî awayî bê tespît kirin û cotkar di vê derbarê de bêne agahdar kirin û teşwîq kirin.

## 9 - AJOTINA 'ERAZIYÊN XEZÎNEYÊ

'Eraziyên ji bo zîre'etê bi bereket yên xezîneyê, bi şertê ku mulkiyeta wê di destê xezîneyê de bimîne, mafên 'eraziyê yên jê îstîfadekirinê, bi şertê ku bi xwe bajon divê bê berdêl bê dayîn cotkarên ku 'eraziyên wan nînin.

'Eraziyên li herêmên sînor yên bi mayin jî divê piştî ji mayîna hatin paqijkirin bi vî awayî bê dayîn gundiyên ku 'eraziyê wan nîn e.

## 10 - PÊŞÎLÊGIRTINA ÎSRAFÊ Û NEQANÛNIYÊ, BI AWAYEKÎ BERDAR BIKARANÎNA ÇAVKANIYAN

Îsraf nexweşîyeke aborî ye. Sedemê windakirina nî'metan e û pêwîst e teqez pêşî li îsrafê bê girtin. Bi taybet îsraf kirina çavkaniyên giştî gihiştiye asteke wisa ku êdî meriv ditirsîne.

Di serê sedemên îsraf kirina çavkaniyên giştî de bikaranîna wan a bi awayê neqanûnî tê. Sedemên neqanûniyê jî gelek in. Lê belê di serê vana de bêexlaqî û feqîriya ji me'newiyatê tê.

Li hember bertîl û neqanûniyê tedbîra herî bi reh ew e ku, hê ji mekteba seretayî ve exlaq û girîngiyên me yên olî bên xistin hişê zarokên me û ji kesba neheq û karên neexlaqî bên parastin. Ji bo di vê derbarê de hişmendiyek bê dayîn zarokên me divê di mufredata perwerdehiyê de sererastkirinên pêwîst in bêne kirin. Di serî de televizyon, wasîteyên ragihandinê yên giştî divê bên bikaranîn û bi rêya van wasîteyan hişmendiyeke di vê derbarê de bê dayîn civakê. Hem divê piştgirî û teşwîqa xebatên saziyên civaka sivîl yên di vê derbarê de dikin bê kirin.

Ji bo dawiya neqanûnî û bertîla ku nexweşîyên herî belav in di civaka me de bê anîn kontrolên pêwîst in divê bên kirin, di xercên giştî de divê zelalî bê temînkirin. Di mewzû'ata îhaleyan de divê sererastkirinên pêwîst bêne kirin.

Yek ji rêyên bi bandor a têkoşîna li hember bertîl û neqanûniyê ew e ku me'aşên memûran bê anîn asteke wisa ku pêdivî bi tu rêyên din nebînin.

Beyana mal a wezîfedarên giştî divê rastiya wê bê kontrol kirin, zêdehiya malê wan yê ne xwezaî divê çavkaniya wê bê lêkolînkirin. Giliyên di derbarê bertîl û neqanûniyê de ku tên kirin divê bi hessasiyet ji aliyê meqamên 'edlî ve bên lêkolîn kirin.

## 11 - KÊMATIYA BUDÇEYÊ Û DEYNDARIYA GİŞTÎ

Beşeke girîng ji çavkaniyan di dana faîzên deynên hindûr û derve de tên bikaranîn. Ev rewş teqez divê bê sererastkirin. Ji bo pêdiviya deynsitendina giştî û barê faîzê ji holê bê rakirin divê sîstema hewzê bê xistin jiyanê.

Di budçeyên ku tên çêkirin de divê hatinî û lêçûn bînin rewşeke ku wekhev bin, deyndariya ku tê wateya; îpotekkirina jiyana neslên dê werin pêwîst e bê bi dawî kirin.

Hatinî, dema di biniya hêviyan de man, divê yekem lêçûn jî bên kêm kirin, dema zarûretê heger ku barekî din li hemwelatiyan bê barkirin jî divê ev sererastkirin bi tenê bi qanûnê bê kirin.

## 12 - DADMENDIYA BACÊ

Di sîstemeke bi dad a bacan de, barê bacê ku dê li hemwelatiyan bê barkirin, divê di nîsbeta mal û hatiniyên wan de be. Ji bilî vê polîtîkayên bacê yên ku tên tetbîq kirin divê bandoreke ku wekneheviya di belavkirina hatiniyan de kêm bike çêbike. Di sîstema baca Tirkiyê de wisa xwiya dike ku kî hindik kesb bike hindik bacê dide, kî jî pir kesb bike pirtir bacê dide. Lê belê di realîteyê de berevajî vê ye. Bacên herî pir, kesên ku hindik kesb dikin didin.

Nisbeta bacên ji malên xeritandinê tên sitendin, bacên ku ji xizmetan bi awayê nerasterast tên sitendin, bacên ku ji me'aş û ucredan ji çavkaniyê tên birîn, di nav hemî bacan de gelek mezin e. Divê bê dadmendî û bê nîsbetiya bacan a li hember hemwelatiyên ku ji bo jiyana xwe bidomînin hemî kesba xwe xerc dikin, bi vî awayî hem dema kesb dikin û hem dema serf dikin bacê didin, bê rakirin.

Ji bo vê yekê;

Divê ji hemî kesên ku ucreda herîkêm distînin bac neyên sitendin. Ji kesbên bi ser ucreda herîkêm de pey ku pêdiviyên bingehî wek xwarin, cil, mesken, tenduristî, perwerdehî û ragihandin hat derxistin ji zêdehiya ma bac bê sitendin.

Nîsbeta bacên ku di mesrefên ragihan û çandê tên sitendin divê bên daxistin asteke maqûl.

Divê ji xaniyê ku mirov tê de rûdinê baca emlakê neyê sitendin.

Divê mewzû'ata bacan ji nû ve bê sererastkirin û hêsankirin, nîsbeta bacan bê daxistin û li zemînê bê belavkirin.

Divê bac nesitendina ji kesên ku tu fe'eliyetên hilberanê nakin û bê ku tu rîskê bistînin pere kesb dikin bê dawî kirin, divê nîsbeta bacên ku ji wan tê sitendin bê zêdekirin.

## 13 - PÊŞXISTINA DARISTANAN, SERERASTKIRIN Û ŞIXULANDINA WAN

Pêwîst e ji bo parastina daristanan tedbîrên ku hene bên zêdekirin, ji bo ku gundiyên li daristanan di parastina daristanan de bi awayê aktîf berpirsiyariyê bigrin ser xwe divê bê şixulandin.

Ji bo mudaxeleya lezgîn a agirpêketina daristanan divê hejmara teyareyên tefandina agir û wasîteyên kar bên zêdekirin.

Ji bo zêdekirina hejmara daristanan, divê 'eraziyên ku ji zîre'etê re nabin bên kirin daristan. Di tespîtkirina cûrên daran de divê pêdiviyên endustriya hilberanên daristanî bê danîn ber çava.

Daristaniya taybetî divê bê teşwîq kirin.

Hê ji mekteba seretayî divê zarokên me di derbarê evîndariya daran û zandariya daristanê de bên zandarî kirin.

Di şixulandina daristanan û hêjandina hilberanên wê de divê pêşanî bê dayîn gundiyê daristanan û bi sektora taybet re hevkarî bê bidestxistin.

## 14 - BAZIRGANIYA SÎNOR

Divê di herêmên sînor de herêmên ji bo bazirganiyê serbest bên çêkirin, bi vê rêyê divê bi dewletên cîran re nîsbeta bazirganiyê bê zêdekirin. Ji bilî vê divê ji bo hilberanên têne îxrac kirin li deverê nêzî sînor bên îmalkirin teşwîq bê kirin.

Ji bo bazirganiya sînor bi pêşkeve divê bingeha rêwîtiya bê pasaport bi bal dewletên cîran re ve bê amade kirin.

Ji bo bi welatên cîranê sînor re, gihanî erzantir û ewletir be, divê projeyên hevkar yên di derbarê gihaniya deryayî û rêyên hesin bên bipêşxistin. Ev proje divê bi lez bên temamkirin û bên pêşkêşkirin ji bo xizmetê. Di heman demê de divê kalîteya rêyênbejayî jî bê zêdekirin.

# **E -** POLÎTÎKAYA DERVEYÊ WELAT

Hêzên hikumran yên siyaseta dinyayê, bi polîtîkaya derve a ku navenda wê berjewendî ye û nêrîna mêtîngehkarî, bi hinceta "em demokrasî û azadiyê dibin" dinyayê û bi taybetî mazlûman û gelên Musulman, di deryayên ku ji hêstirên çavan û xwînê çêkirine de difetisînin. Bi sed salan e ku dewlet û gelên mêtîngeh dikin, pratîkên wan yên ku zirarê dide berjewendiya emperyaliyan û ji mêtîngehî û zilmê re îtîraz in, îro hatine gorandin bi bal sîleha zilmê û mêtîngehiyê ve, Neteweyên Yekbûyî (NY) û Nato jî hatine bikaranîn û bi şer û êrîşan tên gef û belawelakirin.

Polîtîkaya menfe'etperest ku divê meriv li ba yên bi hêz û yên li gor berjewendiya me be, di dema me de polîtîkaya derveyê welat a gelek dewletên dinyê ye, ji ber vê yekê dinya ji zilm û pevçûnê vala nabe. Prensîba me ya sereke a polîtîkaya derveyê welat ew e ku, emê ne li ba aliyên li gor berjewendiya me bin, emê li ba aliyên mafdar bin.

Dema meriv bi navendiya berjewendiyê jî binêre, em bawer dikin ku zilm û mêtîngehî ne di berjewendiya tu dewlet û kesayetî de ye. Zilm heta û heta nadome. Heger ku xwîn û hêstirên çavan neyên sekinandin, mirovên di dewletên ku îro di xuyayî de di nav xweşî û firehiyê de dijîn jî wê xweşî û ewlehiya wan ne di bin garantiyê de be.

Feqîriya ku bi sedem zilm, sefalet û mêtîngehiyê derketiye holê; koçkirina gelên ku hatine 'eciqandin û di bin mêtîngehiyê de ne bi awayê kom kom, bûye sedemê ku pirsgirêka penaberan a gelek mezin derkeve holê. Koçberên ku di mercên bê tenduristî û xeter de rêwîtiyê

dikin, di encama xerqbûna keştiyên ku bi awayê masiyan tê de hatine dagirtin difetisin, carna ji ber ku nayên nêzkirinê sahîlên dewletên ku dixwazin herinê di nîvê deryayê de ji tîna û birçîna dimirin an jî di malên ku ji bo neyên girtin tê de hatine qifilkirin de dişewitin û can didin. Realîteyeke eşkere ye; penaberên ku di welatê xwe de endamên civaka xwe yên bi rûmet in, ji koçê re mecbûr tên hiştin û di civakeka ku xerîbê çanda wan e û tê de ji xizm û mirovên xwe dûr in de bi awayê penaberan dijîn, ne ew kêfxweş dijîn û ne jî dihêlin civakên koç kirine navê kêfxweş bijîn.

Komkirina hêz, xwesteka bûyîna akrotekî bi hêz û peyva wî tê guhdarî kirin di hola navneteweyî de, heger ji bo amanca rakirina zilm û mêtîngehiyê be ev yek tiştekî rewa ye. Lê belê ji bo girtina şûna dewletên emperyalî yên global, 'eciqandina dewletên ze'îf û li paş mane be an jî ji bo di şûna wan de ew kedxwarî û mêtîngehiyê bikin be, bi van amancan xwestina bi hêzbûna siyasî, aborî an jî leşkerî ne amancek rewa û mirovahî ye.

Divê tu demî bi hêzên emperyalî yên global re, ji bo ku karibin zilmên xwe hêsantir bikin hevkarî neyê kirin. Meşandina polîtîkayeke derveyî welat ku li ser pêşîlêgirtina li şeran û xebata ji bo dinya ji sîlehên îmhaya komî safî bibe û bibe warê aşîtî û kêfxweşiyê, ji pêdiviya bawerî û nêrîna me ya li dinyê ye.

Polîtîkaya me ya derveyî welat, li ser bingehên însanî weke; dadmendî, heqaniyet, biratî û piştevaniyê ye.

Xwe veşartina li pey peyveke weke "berjewendiya neteweyî û millî" û bi vî awayî bê deng mana ji zilmên didomin re, hetta hevkarî û spartekbûna ji van zilman re, ne layiqê dewleteke bi rûmet a endamê civaka navneteweyî ye. Lewra ne bi tenê li hindur, li derveyê welat jî zilm ji kî bê bila bê divê meriv li hember zilmê û kî dibe bila bibe divê meriv bi mezlûman re be.

Bi taybetî li cîhana Îslamî û bi giştî li hemî dinyayê, astenga herî mezin li pêşiya sazkirina aşîtî û kêfxweşiya dinyê, zilma siyonîzmê a li ser gelê Filistînê ye. Heta êrîşên ku bineheqî û bê hiqûqî li hember gelê Filistînê yên ku ji aliyê xaçperestên emperyalî ve terorîst têne qebûl û î'lan kirin bidomin, sazkirina aşîtî û kêfxweşiyeke dewamî wê ne pêkan be.

Pirsgirêka herî mezin a herêmê rejima mêtîngeh siyonîst Îsraîl, divê bê bidestxistin ku ji hemî erdên dagirkiriye vekişe û Dewleteke Filistînê a serbixwe bê damezrandin.

Ambargoya ku; Neteweyên Yekbûyî (NY) ku li ser rewşa wê a vêga em wê rexne dikin û ne dadmendî didêrin jî hemberî hiqûqa navneteweyî qebûl dike, dorpêça deryayî û avakirina avahiyên nû, digel îtîrazên civaka navneteweyî jî didome. Lewra îtîrazên ku têne kirin di peyvê de û ze'îf dimînin, tu mueyyîde nayên tetbîq kirin. Van îtîrazan bi dengekî bilind û bi biryar bên kirin, tetbîqatên rejima Siyonîst yên derveyê mirovahiyetê divê bi mueyyîdeyên giran ve bên girêdan.

Heger polîtîkayên ku zilmê bide sekinandin neyên pêşkirin, dê sînorên zirarê bi tenê gel û welatê Filistîn di xwe de nehewîne, hemî mirovahiyet dê jê nesîbê xwe bistîne.

Divê bi rejima Îsraîl a Siyonîst re hemî têkilî bên qut kirin û ji naskirina wê a weke dewletekê bê qerandin.

Divê weke vê Kurdên Musulman yên ku bi sed salan e li welatê xwe dijîn û bi sînorên sun'î bi çar parçeyî hatine parçekirin û di navbera wan de têlsincik û mayin hatine raxistin weke berê wek gel û milletekî bên naskirin, sînorên sun'î ji navbera wan bên rakirin û ji bo pêkanîna piştevaniya aborî, çandî, civakî, siyasî û hiqûqa sileyê rehmê gavên divê bên avêtin. Xerîbhiştin û dûrxistina

Kurdên Musulman yên ku milletek in û mirovê hev yê nêz in zilmekî gelek mezin e. Awayê wan yê îdarî û siyasî çi dibe bila bibe divê sînor û cudatiya di nav Kurdên Musulman ku bira û mirovên hev in bê rakirin, ji bo têkiliyên mirovahiyê bikevin rêya xwe çi tedbîrên divê pêwîst e bên sitendin.

Divê li ser Heremeyn (Mekke û Medîne) ya ku girîngiyên hemî cîhana Îslamê ne îdareke xweser an jî bi temamî serbixwe bê avakirin. Divê sîstema ku bê çêkirin ji aliyê meclîseke ku ji hemî cîhana Îslamê endaman di xwe de dihewîne bê meşandin.

Êrîşeke ku li hember van girîngiyan bê kirin, divê weke ku ji hemî Ummeta Îslamê re hatibe kirin bê qebûl kirin û xetteke parastinê a hevpar bê çêkirin.

Ne tiştekî pêkan e ku Neteweyên Yekbûyî (NY) û bi taybetî jî Konseya Ewlehiyê bi vê rewşa xwe ya îdarî karibe xizmetekê ji aşîtiya dinyê, dadmendiya global û aramiyê re bike. Sê endamên Konseya Ewlehiyê yên ku mafê wetoyê di destê xwe de digrin ji bloka Rojava-Fille û du endam jî ji bloka sosyalîst in. Nedayîna mafê temsîlkirinê, bi wateya erdnîgariyê ji ‘Efrîqa û Amerîkaya Başûr re û bi wateya çandî û olî ji cîhana Îslamê re û nedayîna hêz û raya wetoyê ku karibin pêşîlêbigrin ku endamên dewamî bi serê xwe biryaran bistînin ne karekî bi dadmendî ye. Sîstema biryar sitendinê a bi vî awayî ne bi dad e, dibe sedem ku biryara hatiye sitendin çi bila bibe hissa dadmendiyê derbe bixwe. Ev sîstema bi vî awayî ji ber vê yekê divê dewam neke.

Belavkirina aramî, aşîtî û firehiyê bi tenê bi rakirina vê sîstema hanê pêkan e. Rakirina sifata endamê dewamî, hilbijartina hemî endamên konseya ji panzdeh endaman hatiye çêkirin ji bo dembihûrekî, temsîlkirina her parzemîn û baweriyê li gor pir bûna nifûsa bi awayê

nisbî, nebûna mafê wetoyê ji bo tu endamî, sitendina biryaran bi raya piraniyê çareseriya herî bi dadmendî û li gor heqaniyetê ye.

Saziyên wek IMF, Bankaya Dinyê û Rêxistina Bazirganiya Dinyê, bi awayê wasîteyê mêtîngehiyê a emperyalîzma siyonîzmê tên bikaranîn.

Dema bi vî awayî tê nihêrtin IMF, ji bo ku dewletên din yên dinyê bi xwe ve girêde dewamî wan ji xwe re dike deyndar. Bi vî awayî dema bivên dikarin aboriya dewletên divên xirabikin û di wê dewletê de kaos û teqîna civakî çêkîn.

Ji ber vê yekê pêwîst e bi şiddet ji deyn sitendina ji IMF'ê û ji tetbîq kirina bernameyên wan bê revîn û welat bê parastin.

Serxwebûna aborî mercê pêşî yê serxwebûna siyasî ye.

NATO ya ku di sala 1949'an de bi endamtiya 12 endaman hatiye damezrandin, pey belavbûna Yekîtiya Sovyetan di sala 1991'ê de, dest bikaranîna rola xwe a parastinê "di derveyê seha xwe de" kiriye. Ji bo van projeyên ku li gor amanca "Sîstema Dinyê a Nû" a Amerîka ne bên tetbîq kirin, karên gelek girîng li ser pişta NATO hatine siwar kirin.

Dewletên mêtîngeh bi awayekî organîze xebitîne ku di nava Îslam û terorîzmê de girêdaneke bi hezeyana "Terora Îslamî" çêbikin û bi vî awayî hedefa nû a NATOyê tespît kirine.

NATO ya ku serê wê Emerîka dikişîne, di dema nû de çênebûna yekîtiyeke alternatîf a siyasî, aborî û leşkerî li hember yekîtiya Rojava Fille, bi taybetî jî çênebûna yekîtiya welatên Îslamê ji xwe re wek wezîfeyekê pejirandiye. Bi vê amancê ketiye hewldana ku tovên neyartiyê biçîne û îxtîlafên erdnîgarî û mezhebî bipêşxe. Dema vê yekê dike kesên ku li hember vê amanca wê disekinin "terorîst" îlan

dike û li hember welatên Îslamê metodên êrîşên fi'ilî, mêtîngehî, bi ambargoya şikandina hêza wan an jî bi tevlîheviyên navxwe xirakirina îstîqrarê tetbîq dike.

Yek ji amancên wê ew e; pêşî lê bigre ku li Rohilata Navîn û li cîhana Îslamê dewleteke ku ji Îsraîl bi hêztir e dernekeve û welatên Îslamê û dewlemendiyên wan ku ji % 70 danheviyên enerjiya dinyê di xwe de dihewîn in têxe bin kontrola xwe.

Hêzên emperyalî yên global dema van polîtîkayên xwe yên dagirker û mêtîngehî pêktînin hewl didin ku rûyê xwe yê heqîqî bi mafên însanî, demokrasî, azadî û têkoşîna li hember terorîzmê biveşêrin.

Bi kurtasî; di projeya "Yekîtiya Medeniyetan" a ku bi pêşîvaniya NATOyê hatiye destpêkirin de, her çiqas di xuyayî de wezîfeyeke nû li ser pişta NATOyê hatibe barkirin jî, a rast ew e ku Emerîkaya hêza herî mezin a di nav NATO yê de pirtir nêzî teza "Pevçûna Medeniyetan" e û eşkere ye ku di çarçoveya vê tezê de bi hincetên cuda welatên Îslamê bombebaran û dagir dike. Şermeke mezin e ku welatekî Îslamê wekî Tirkiyê van operasyonên zilmê yên NATO yê tesdîq dike û di wan de bi awayê aktîf cî digre. Tirkiye heger bera nikaribe pêşî li van zilman bigre, herî kêm di vê nebe şirîkê van zilman.

Pêvajoya endamtiya Yekîtiya Ewrûpa a ku ji bo di têkoşîna li hember statukoyê de bi hêz be hat ketinê, vêga di domandina wê de tu feyde xwiya nake. Dema ku krîzên aborî yên Yekîtiya Ewrûpa di nav xwe de ketiyê û daxuyaniyên qet'î yên du dewletên herî mezin yê Yekîtiya Ewrûpa: "ku wê tu demî Tirkiye nekin endam", a rast ew e ku ev pêvajo bê bi dawî kirin. Bi dewletên Ewrûpa û saziyên navneteweyî re bi awayê minasibê heqaniyetê û di çarçoveya berjewendiyên miqabilê hev de dibe ku têkilî bên bipêşxistin.

Em girîngiyeke bi taybet didin têkiliyên di nav welatên Îslamê de. Di şûna Yekîtiya Ewrûpa a 400 Milyonî, bi awayê berêxwedana cîhana Îslamê a Milyarek û Nîv, bazirganiya hevkar, perê hevkar û rakirina sînoran pêwîst e yekîtiyeke ku yekbûneke tam ji xwe re dike amanc bê sazkirin.

Divê ji bo bi welatên Musulman re di asta bilind de hevkarî bê kirin hewl bên dayîn. Ji bo vê yekê divê di bin Rêxistina Hevkariya Îslamê de an jî di bin perê rêxistineke din de avahiyeke siyasî a bi hêz ku di xwe de hêza leşkerî jî dihewîne bê çêkirin. Yekîtiyeke bi vî awayî bi rastî jî wê ji xêra hemî dinyayê re be. Ev avahiya siyasî, divê bi ser hemî pirsgirêkên herêmî ve here û pirsgirêkên hene çareser bike, bi vî awayî dîktatoriyên zalim, gengeşiya Şi'î-Sunnî, pirsgirêkên nijadî û hemî pirsgirêkên ji ber berjewendiyên neteweyî ne, bi mudaxeleya yekîtiyê a dadmend û bi hêz divê bên çareserkirin.

Bi vî awayî divê pêşî li mudaxeleyên dewletên derveyî cîhana Îslamê bê girtin.

Ji bo dewletên birçîbûnê dikişînin bên bi pêşxistin divê fonek bê çêkirin û divê bê pêwîstkirin ku welatên endamê yekîtiyê li gor dahatiyên xwe beşdarî vê fonê bibin.

Ji pêdiviya prensîba "Bi cîranên xwe re bi başî tevbigerin", bi welatên cîran re bûyîna di nav aşîtiyê de, bê cudawaziya ol û nijadê piştevaniya mezlûm û xwedîmafan, ji prensîbên sereke yê polîtîkaya me ya derveyê welat e.

Pêwîst e bi dewletên cîran re têkiliyên aborî, civakî û çandî bên bipêşxistin. Divê van têkiliyan di çarçoveya berjewendiya miqabilê hevûdin de û di çarçoveya cîraniya baş de bên meşandin.

Têkiliyên bi dewletên nêz û dûr re tên kirin, divê ji bo berjewendî û xatirê hinekan xiranebin.

Pêwîst e mexdûriyeta malbatên ku ji ber sînorên sun'î hatine kişandin navbera me û welatên cîran ji hev qetiyane, parçebûne bê telafî kirin û ji bo hiqûqa sileyê rehmê bê pêkanîn gavên pêwîst in bên avêtin.

Divê hemî astengên li pêşiya zêdekirina îtxalat û îxracata bi cîranan re bên rakirin.

# F - POLÎTÎKAYÊN CIVAKÎ

## 1 - PERWERDEHÎ

Perwerdehî, çalakiya bi pêşxistin û şekildana qabiliyetên jidayikbûnê ve di mirov de hene û anîna mirov rewşeke ku erkên xwe yên olî û dinyayî karibe pêkbîne ye.

Amanca sereke di perwerdehiyê de; bi pêşxistina beden û 'eqlê, bihêzkirina îradê, terbiyekirina rûh û bedenê, gihandina mirovên exlaq xweş, baş û gihîştî, amadekirina nifşê ji jiyan û paşerojê re ye.

Weke do îro jî pêdivî bi nifşeke ku zanîn û baweriya xwe ji xwe re kirine rêber, Îslamê kamil fêmkirine û kêfa jiyandina wî bi evîna Xweda re kirine yek û bi awayê aktîf û erênî beşdarî jiyana civakî dibin û pêşîvaniya civakê dikin heye. Bêguman ev pêdivî, bi perwerdehiyeke ku zanîn û hîkmetê dighîne hev û mirov dike aktîf û bihasil tê bidestxistin.

Hêmanê herî girîng di perwerdehiyê de zanîn e. Astenga herî mezin li pêşiya perwerdehiya îdeal jî dejenerekirina zanînê ye. Çavkaniya bingehî a dejenerekirinê, kirina zanîna ku çavkaniya girîngiyên civakê ye, ji bo berjewendiyên dinyayî û amancên îdeolojîk wek wasîteyekê ye.

Ji bo ku roj û paşeroja sîstema perwerdehiyê bê fêmkirin divê di çarçoveya girîngiyên Îslamî û tecrûbeyên Musulmanan yên dîrokî de bê sererastkirin û divê ne tenê bi fêmeke jibervaniyeke ku zanînê dewr dike, bi fêmeke ku mirov perwerde dike, hîn dike, terbiye dike li serê bê sekinandin.

Sîstema Perwerdehiyê, pêwîst e bi destpêkirina ji kelîmeya "perwerdehiyê", bi têgîn, çavkaniyên agahî, danasîn û mînakên xwe ve ji serî heya binî bê jêpirsîn kirin, hemî girîngiyên Îslamî yên ku bi pejirandina sîstema perwerdehiyê a Frensa di sala 1867'an de hatine windakirin, divê ji nû ve bên xistin nav sîstema perwerdehiyê. Ji vê yekê amanc ne ew e ku, di mekan û wasîteyan de bi paş ve bê vegerandin, amanc ew e ku; ji teqlîda rojava bê xilaskirin û tenzîm û sererastkirina perwerdehiyê li gor pêdiviyê 'esrê ne. Amanc ji nû ve gihîştandina zanînê ye.

Zanista ku li rojava veguheriye bibal hilberanên pratîk û di dema vê veguherînê de ji amanca xizmetkirina ji mirovahiyetê re hatiye dûrxistin, di bingeha xwe de tecrûbeyên mirovahiyetê yên hevpar in. Di vê tecrûbeya hevpar de para herî girîng jî bêguman a ehlê tewhîdê ye. "Pêşketina zanistî" wek bûyerekê nabe ku bê redkirin. Lê belê danasandina "rastiyên zanistê" bi awayê "rastiyên teqez" tê wateya perestina mirovan ji berhem û hilberanên xwe re. Ev danasandin nabe ku bê qebûlkirin. Zanist ne rastiya teqez e, tevahiya tecrûbeyan e ku di xwe de îhtîmala xeletiyê dihewîne.

Pêşketina di her holê de, bi potansiyela mirovên baş hatine perwerdekirin ve girêdayî ye. Perwerdehî, digel ku gihîştandina asta herî bilind di refah û pêşketinê de ji xwe re dike amanc jî, lê belê di welatê me de nehatiye gihîştin asta ku tê xwestin. Sedemê vê yekê mana perwerdehiyê di bin tesîra mudaxeleyên siyasî û îdeolojîk e. Saziyên perwerdehiyê, hatine guherandin bi bal wasîteyên ku tîpeke jiyanê zor dikin, kalîteya perwerdehiyê ketiye, wekheviya derfetê ji holê hatiye rakirin, ciyên perwerdehiyê hatine guherandin bi bal ciyên ku mirov ji girîngî û me'newiyetê tên dûrkirin.

Van tetbîqatan mafê perwerdehiyê yên gelek mirovan ji destê wan sitendiye. Ji ber van tetbîqatên ku ne li gor afirîş û tebî'eta gelê me ne li welat bi salan e bi milyonan zarokên keç ji mafê perwerdehiyê mehrûm hatine hiştin. Bi sîstema perwerdehiyê a ku hatiye zorkirin neslên ku bi girîngiyên civaka xwe re lihevnake hatine mezin kirin. Di encama van tetbîqatan de tekamula civakî, aramî û aşîtî nehatiye temînkirin. Divê perwerdehî û hîndekarî ji 'unsûrên îdeolojîk bên paqijkirin.

Di perwerdehî û hînkirinê de digel xemilandina mirovan bi zanîn û kirhatiyan em gelek girîngiyê didin rakirina mirovan bi exlaq û terbiyê jî. Di çarçoveya girîngiyên me de perwerdehî, hîndekarî û 'unsûrên terbiyê ku em mijara herî girîng dibînin; di vê dema ku qîmeta mafên mirovan û azadî zêde dibe, pêşbaziya navneteweyî leztir dibe û guherînên ku serê meriv gêj dikin çêdibin em dikarin bi ferdên di asta herî bilind de xwe xemilandine biparêzin û bi hêz bikin.

Refah û pêşketina nifşên pêşî, bi standard û pêvajoya perwerdehiyê a ku tê tetbîq kirin ve girêdayî ye. Hemî serkeftinên welêt, encamên ferdên baş hatine perwerdekirin in. Ji ber vê yekê divê ji xezînê para herî mezin ji bo perwerdehiyê bê cuda kirin.

Pêwîst e kalîteya perwerdehiya mektebên dewletê bê zêdekirin, sehayên teknolojîk bên bipêşxistin û ji nû ve jêpirsîna mufredata tê xwendin bê kirin. Divê ku perwerdehî ne bi tenê ji aliyê yên tên perwerdekirin divê ji aliyê kesên ku perwerde dikin ve jî bê bipêşxistin û bi hêz kirin.  Mektebên ku perwerdekar û mamosteyan radikin jî divê li gor vê nêrînê ji nû ve bên avakirin û perwerdekar û mamosteyên li gor exlaq û girîngiyên civakê bên rakirin.

Perwerdehiya meslekî divê ji nû ve bê avakirin û bê anîn rewşeke wisa ku karibe tevkariyê li aboriya welêt bike û pêdiviya hosteyên pêwîst in pêk bîne. Hê ji dereca yekem a perwerdehiya seretayî de divê ji bo tercîha meslekê rê li ber xwendevanan bê xistin. Divê saziyên perwerdekirinê bên anîn rewşeke wisa ku; hevkariya wan û tenduristiyê hatibe zêdekirin, zanista wan a teknîkî hatibe zêdekirin û van saziyan hatibin asteke wisa ku dikarin teknolojiyên bilind îmal bikin. Amanca me ew e ku; sîstemeke perwerdehiyê a meslekî ku dikare di sehayên welêt pêdivî dibîne de, hilberaneke minasib û dînamîk bike bipêşxin.

Divê bê temînkirin ku zanîngehên me bi qada bazirganî û kar re di nav hevkariyê de bin û digel odeyên bazirganî û endustriyê, rêxistinên meslek û rêxistinên civaka sivîl re sehayên ku pêdiviya qada bazirganî û kar bi karkerên pispor heye bê tespît kirin û li gor vê pêdiviyê karker bên perwerdekirin.

Dinya ku bi bal globalbûnê ve diçe êdî bûye wek gundekî biçûk, di vê dinya global de di têkiliyên navneteweyî de, di zanist, tenduristî, teknolojî û di hê gelek sehayên din de ji bo dan û sitendina zanistî pêdivî bi zanîna ziman heye ji ber vê yekê divê kesên zimanên biyanî zanin bên zêdekirin.

Divê Qurana Pîroz, Zimanê ‘Erebî, hedîs, îlmîhal û siyer di mekteban de hê ji sala yekem a mekteba seretayî ve ders bên dayîn. Di vê mijarê de divê ji sazî û avahiyên pispor îstîfade bê kirin. Dîsa divê astengên pêşiya saziyên sivîl yên di vê sehayê de dixebitin bên rakirin. Divê ji fonksiyona mizgeftan a di perwerdehiyê de bi awayê herî rind bê îstîfade kirin û divê vekirina saziyên perwerdehiyê û hînkirinê yên bi taybet serbest bin.

Di pêşketina şaristaniya me de rola medreseyan gelek mezin e. Bi vê sedemê medreseyên kevn divê bên ava û restore kirin. Dema di perwerdehiya medresê de derbasbûye divê ji perwerdehiya mecbûrî bê hesap kirin. Xwendevanên ku ji van medreseyan destûrname wergirtine pey ku ji hinek ezmûnan derbasbûn divê destûrnameya bi mektebên din re wekhev bê dayîn wan.

Divê di pirtûkên dersan de cî bê dayîn jiyan û berhemên zanayên ku di sehayên ol û hunerê de berhemên balkêş û şaheser hiştine.

Divê zimanê gelên ku dewletê damezrandine bi awayekî fermî bê nasîn. Ji bo ku herkes karibe bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdehiyê bike divê sererastkirinên ku divên bên kirin.

Divê ji sîstema perwerdehiya tevlîhev a mecbûrî bê qerandin, malbatên ku dixwazin divê karibin keç û lawên xwe di her dereceya perwerdehiyê de di mektebên keçikan û mektebên kurikan de bidin xwendin.

Di saziyên perwerdehiyê de yekîtiya malbatan divê bê pêşxistin. Bi tevlîbûna aktîf a weliyan ji perwerdehî û hînkirinê re divê modela perwerdehiya bi kontrol bê bi pêşxistin.

Ji bo hemwelatiyên astengdar karibin ji mafê perwerdehî û hînkirinê îstîfade bikin divê tedbîrên pêdivî bên girtin.

Divê qedexeya şerpe û sernixumandinê a ku bi salan e wek kabûsekî li ser singa welatê me û hemwelatiyan rûniştiye û rojên gelek xirab bi keçên me daye jiyandin bi temamî bê rakirin û pêwîst e di her dereceya perwerdehiyê de mamoste û xwendevan dikaribin bi hîcab û sernixumandî herin mektebên xwe.

Di ezmûna derbasbûna hînkirina bilind de divê wekheviya derfetê bê tesîs kirin. Ji bo xwendevan karibin

ji bûrsan bi awayê herî rind îstîfade bikin divê fon bên vekirin. Tiştên ku hatine musaderekirin divê ji bo bûrsên perwerdehiyê bên bikaranîn.

Divê pêdiviyê xwendevanên zanîngehan bê danîn ber çavan û li gor vê divê mebîtên keçik û kurikan û mebîtên kesên zewicîne bên avakirin.

Divê Saziya Hinkirina Bilind / YOK bê rakirin û zanîngeh, ji aliyê akademîk, rêveberî û malî ve bên xistin bin avahiyeke xweser. Ji bo koordînasyona di navbera saziyên Hinkirina Bilind de çêbike divê organizasyoneke ufqî bê sazkirin.

Divê Zanîngeh bên anîn ser nasnameya wan a 'esil û bibin saziyên ku li ser mamoste û xwendevanan tu tezyîqat û zordarî nîne.

Di her dereceyê û holê de divê vekirina saziyên perwerdekirinê û hînkirinê yên bi taybet serbest bin û divê piştgiriya zanîngehên Weqfan bên kirin.

Divê xwendevanên feqîr jî karibin perwerdehiyeke rind bistînin. Ji bo pêşî li windabûna dema xwendevanên zîrek û zekaweta wan pir bê girtin, bi bernameyên perwerdekirinê yên bi taybet di demeke gelek kin de divê bê temînkirin ku dest bi hînkirina bilind bikin.

Ji bo hemwelatî û zarokên hemwelatiyan yên li derveyê welêt dijîn perwerdehî û hînkirineke li gorî baweriya xwe bibînin çi pêwîst e divê bê kirin.

Di saziyên bi zimanê zikmakî perwerdehiyê dikin de, ji bo rakirina mamosteyên ku di her hola perwerdehî û hînkirinê de perwerdehiyê dikarin bikin, divê di zanîngeha de beşên pêwîst in û têrî vê pêdiviyê dikin bên vekirin.

## 2 - TENDURISTÎ

Parastina tenduristiya hemwelatiyan ji erkên sereke yên dewletê ye.

Di vê çarçoveyê de;

Ji bo hê nexweşî çênebûye pêşî lê bê girtin pêwîst e qîmet bê dayîn xizmetên tendurîstî yên parêzger. Divê li ser tenduristiya dê û zarokan bi girîngî bê sekinandin.

Divê sektora endustriya derman û tenduristiyê bê xistin bin kontroleke hişk. Di xizmetên tenduristiyê de divê rêzikên reqabetê bên tespît kirin û ji bo pêşî girtina bê qanûnîtî û destkeftinên neheq zagonên divên bi lez bên çêkirin.

Pêwîst e hejmara nexweşxaneyan bê zêdekirin û nexweşxane bi îmkanên teknolojîk yên modern bên xemilandin û standard û kapasîteya nexweşxaneyan bê zêdekirin. Nexweş, divê mecbûr neyên hiştin ku ji bo tedawiya xwe herin bajarên dûr.

Di sehaya Tibbê de divê girîngî bê dayîn belavbûna lêkolîn û pêşvebirina zanistî û ji bo vê yekê divê fonên piştgiriyê bên çêkirin.

Ji bo ku xwendevanên li fakulteyên tib, dermanxane û hekîmtiya diran û li mektebên meslekî yên tenduristiyê dixweynin hînê pêşketinên nû di sektora tenduristiyê de bibin û bi fêrbûna teknîkên nû perwerde bibin divê bi zanîngehên derveyî welat re hevkarî bên bipêşxistin û ji bo zêdekirina kalîteya perwerdehiyê tedbîrên pêwîst in bên sitendin.

Pêwîst e perwerdehiya tenduristiyê di standarda dinyê de bê temînkirin.

Divê piştgiriya endustriya dermanan û ekîpmanên tibbî bê kirin, teşwîqên li razandinên tenduristiyê ji nû ve bên sererastkirin.

Li kargehan li hember nexweşînên meslekî tedbîrên astengker divê bên bidestxistin û divê ji bo ku pêşî li astengdariya bi sedem qezayên trafîkê, qezayên kar û qezayên bi sedem îhmalan çêdibin bên girtin, xebatên perwerdehî û zandarkirinê bên kirin.

Emekdarên ku di sektora tenduristiyê de dixebitin divê mafên wan ji nû ve bên sererastkirin û bê anîn asteke di standardên navneteweyî de.

Pêwîst e li bajar û navçeyan bi qasî têrî pêdiviyê bike mêvanxane bên avakirin û divê nexweş û merivên nexweşan yên ku li ciyên rûdinên îmkana tedawiyê nîne û ji bo tedawiyê çûne hinek bajarên dinê li van mêvanxaneyan bên hewandin. Nexweşxaneyên ku dê nû bên avakirin divê li gorî ku tê de mêvanxane jî hebin projeya wan bê çêkirin.

Standardên ku hatine danîn ser hilberandina zadên bi tenduristî divê ji nû ve bên kontrol kirin û divê firotina zadên genetîka wan hatiye guhertin bê qedexe kirin. Divê bê danîn ber çavan ku piraniya gel Musulman e û li gor vê yekê sererastkirinên di derbarê zadên helal û goştê helal de bên kirin.

Divê cezayê kesên ku hilberan û çêkiriyên ne li gor standarda ne û zirarê didin tenduristiya mirovan difiroşin bi awayê ku men'a wan ji vê yekê bike bên zêdekirin.

## 3 - EWLEHIYA CIVAKÎ Û SUXREYÊN CIVAKÎ

Em ewlehiya civakî weke mafekî bingehî a mirovahiyê dibînin. Mafê herkesî a ku xwedî ewlehiya civakî ku baribe pê xwedîbûn, debar, hewîn, nihêrtina tibbî û mesrefên perwerdehiyê pêkbîne heye.

Di rewşên weke; bêkarî, nexweşî, seqetî, jinebîtî, û yextiyariyê de ji bo ku însan nekevin nav sefaletê ji erkên bingehî yê dewletê ye ku ewlehiya civakî ava û temîn bike.

Pêwîst e li dê û zarok alîkarî û xwedîbûnek bi taybet bê kirin. Şert û mercê pîrekên dişuxilin û zarokên wan hene divê bê anîn asteke li gor rêzdariya mirovahiyetê.

Divê pêşî li xebitandina karkerên bê sîgorta bê girtin û hem karker û hem jî zarok û jinên wan bên xistin bin ewlehiyê.

Astengdarên ku divê tedawî û xwedîtiya wan bê kirin divê tedawî û xwedîtiya wan bê hêsankirin û ji astengdaran re rehabîlîtasyona tibbî bê kirin.

Perê ku bi alîkariya civakî tê dayîn yextiyar û muhtacan, divê bê zêdekirin. Divê ji bo xwedîkirina yextiyarên muhtaç di nav malbata wan de bê kirin teşwîq bê kirin. Malbatên ku li yextiyar û zarokên xwe yên astengdar dinihêrin, divê bi alîkariyên rasterast û daxistina bacên wan piştgiriya wan bê kirin. Van malbatan ji bo perwerdehî û rehabîlîtasyona zarokên wan divê piştgiriya wan bê kirin.

Divê pirsgirêkên perwerdehî û hewandinê yên zarokên li kolanan, yextiyarên bê xwedî û kesên maleke wan tê de bihewin nîne bên çareserkirin, dema pêdivî hebe divê tedawiya wan bê kirin. Ji bo xwedîbûna li zarok û yextiyarên bê xwedî divê hejmara mebît û malênaramiyê bên zêdekirin û mercên wan bên rind kirin.

Ji bo çareserkirina pirsgirêkên yextiyar û mirovên ‘aciz divê bi rêxistinên civaka sivîl re bi hevkarî bê xebitîn.

Divê ji bo ku komele û weqfên ji bo pêşketina ferd û civakê bi awayekî tenduristî dixebitin dikaribin suxreyên xwe bi hêsanî bikin pêşiya wan bê vekirin û hêsanî ji wan re bê kirin.

## 4 - MALBAT Û JIN

Bidestxistina kêfxweşî û aşîtiyê, bi rakirina mirovên xwe bi girîngiyên me’newî û exlaqî xemilandine pêkan e. Mamosteyê yekem yê mirov malbata mirov e û yê ku civakê perwerde û radike jin e. Yek ji esasên polîtîkaya me ya civakî ev e ku; pîrek bê qîmet û ciyê ku mafê wê ye û dikaribe wezîfa xwe ya sereke pêkbîne.

Yek ji polîtîkayên me yên sereke yê ku em dixwazin di destpêkê de pêkbînin, astengkirina pêşiya îstîsmara

zayendî û aborî a jinê ye û têkoşîna li hember tundîtiya li jinan tê kirin û qîmeta ku mafê wê ye dana wê ye.

Bingeha civakê malbat e. Çavkaniya kêfxweşî, piştgirî, aşîtî, hezkirin û rêzgirtinê malbat e. Zewac û avakirina malbatê mafê herî însanî û bingehî a her jin û mêrî ye.

Zewicandina xortên ku ji ber bêîmkaniyên maddî nikarin bizewicin û temînkirina wê yekê ku bibin xwedî malbateke ji wezîfeyên bingehî yê dewleta civakî ye ku divê bicihbîne.

Pêwîst e bi her awayî piştgirî bê dayîn zewac û sazkirina malbatê û bê teşwîqkirin. Parastina avahiya malbatê di heman demê de parastina civakê û paşeroja me ye.

Pêwîst e dewlet tedbîrên ku saziya malbatê diparêze bistîne. Nifşên ku bi rêyên ne meşrû' çêbûne ji bo civakê felaket in. Têkiliyên ne bi rêya zewacê yên ku li 'adet, girîngî û li çanda me nayên û hilberana jiyana di tîpa rojava da ne, ewlehiya nifşê bi gef dikin. Zarokên ku neseba wan nayê zanîn, ji şefqeta dê û bab bêpar mane û zarokên di malbatên belavbûne de mezin dibin, siberoj dê hem ji bo dewletê û hem jî ji bo civakê bibin kêşe. Pêwîst e pêşî li têkiliyên ji bilî zewacê yên ku dibin sedemê çêbûna civakeke ku ji dilovanî û şefqetê bêpar e û bi tenê nefsa xwe difikire bê girtin.

Ji bo navbera jin û mêrên hatine ber berdana hev bê çêkirin, pêwîst e îmkan bên dayîn saziyên civaka sivîl an jî kesayetên dê navbervaniyê bikin. Van hewlan divê ji aliyê dewletê ve bên teşwîq kirin û hejmara kesên jinê xwe berdidin bê daxistin û avahiya civakê bê parastin.

Di çarçoveya van esasên giştî de;

Ji bo ku jin, dema şuxla ji bo debara malbata xwe zarokên xwe û malbata xwe îhmal neke, di jiyana kar de divê sererastkirinên zagonî û rindkirin bên kirin.

Dema sererastkirin di derbarê jinan de bên kirin divê bawerî û girîngiyên civakî bên danîn ber çavan. Divê bal bê dayîn ser wê yekê ku jin di karên li gor fitreta wan de bên şixulandin.

Ji bo pêşîgirtina tundiya li hember jin û zarokan divê tetbîqatên astengker û sererastkirinên hiqûqî bên kirin.

Ji bo tespît kirina weşan û sedemên ku teşwîqa hev berdana mêr û jinan dikin û ji bo tespîtkirina sedemên hev berdana jin û mêran û lihevanîna wan divê bi saziyên civaka sivîl re hevkarî bê kirin.

Divê kerxane bên girtin û tedbîrên ku pêşî li fuhşê digirin bi lez bên sitendin.

Divê asta jinan a xwendin û nivîsandin û perwerdehiyê bê bilindkirin û astengên li pêşiya vê yekê bên rakirin. Sedemê herî mezin a kêmbûna xwendin û nivîsandinê qedexa sernixumandin û hîcabê ye, divê sernixumandin û hîcab serbest bê berdan û bi vî awayî asta perwerdehî û hîndekariyê bê zêde kirin.

Ji bo ku kesên dixwazin bizewicin û bibin xwedî malbat vê daxwaziya xwe pêkbînin divê ji Saziya Alîkariya Civakî re ji çavkaniyên rayagiştî foneke ekstra bê cudakirin.

Ji bo zarokên nû ji dayikbûne divê alîkariyeke maqûl bê kirin û di pêkanîna mesrefên zarokî de divê destek bê dayîn malbatê.

Divê sedemên ku zarokan mecbûrê şixul dikin bên rakirin û bê astengkirin ku zarok ji aliyê malbatê ve bên îstîsmar kirin û li kolanan bên şixulandin.

Bi krediyên muhleta wan dirêj yên ji bo xwedîbûna xanî, divê bê temînkirin ku malbat bibin xwedî xanî.

## 5 - XORTANÎ Û WERZÎŞ

Parastina xortaniyê, bidestxistina wê yekê ku ji bo mirovahiyetê û civakê bibin kesên mefadar û rabûna wan a bi exlaq, zanîn û tenduristî divê di nav erkên dewletê yên yekem de be. Bi vê amancê pêwîst e bi saziyên civaka sivîl re û rêveberiyên mehellî re hevkarî bê kirin û sererastkirinên pêwîst in divê bên kirin.

Pêwîst e di derbarê weşanên pornografîk û mustehcen yên ku rûh, laş û mêjiyê xortan bi awayekî xirab dixe bin bandora xwe, tedbîrên astengker bên sitendin. Divê di vê derbarê de kontrol bên zêdekirin û divê bê temînkirin ku medya di vê derbarê de rolek û berpirsiyariyeke perwerdikar bigre ser xwe.

Ji bo ku xortên me yên ku li derveyê welat dijîn ji bawerî û girîngiyên xwe re nebin biyanî û xerîb û asîmîle nebin di vê derbarê de pêwîst e bi saziyên civaka sivîl yên ku di vê derbarê de dixebitin re hevkarî bê kirin û tedbîrên pêwîst in bên sitendin.

Ji bo tenduristiya bedenî a civakê li hemî deverên ku ciyê meskenê ne divê kompleksên sporê yên ser wan vekirî û girtî û ji hemî gel re vekirî û belaş bên avakirin û divê werzîşên amator bên teşwîq kirin.

## 6 - HEMWELATIYÊN ASTENGDAR

Pêwîst e destûr neyê dayîn ku li tu kesî ji ber astengiya wî ya bedenî an jî mêjî mu'amela sinifa duyem a mirovan bê kirin.

Yek ji erkên bingehî yê dewletê jî ev e ku; ji bo hemwelatiyên astengdar ji xizmetên rayagiştî bi wekhevî îstîfade bikin û bê ku pêdivî bi tu kesî bibînin tevlî jiyanê bibin çi pêwîst e divê bê kirin.

Divê bi rêveberiyên mehellî re hevkarî bê kirin û ji bo hemwelatiyên astengdar bi hêsanî dikaribin bigêjinê

sehayên bajarî, kargeh, rayagiştî û derketin û ketinên avahiyên bi taybet divê tedbîrên avahî bên sitendin û sererastkirin bên kirin. Ji bo vê yekê divê sererastkirinên zagonî bên kirin.

Hindikiya otoparkên ji bo astengdaran hatine taybetkirin divê bê danîn ber çava û hejmara van otoparkan bê zêdekirin.

Ji bo ku hemwelatiyên astengdar dema jiyana xwe a civakî didomînin jiyana wan bê hêsantirkirin divê îstasyon û wesayîtên birin û anînê bêne revîze kirin.

Pêwîst e sererastkirinên ku teşwîqa hemwelatiyên astengdar bi bal tevlîbûna civakê û jiyana xebatê ve dikin bên kirin. Divê tetbîqkirina zagonên ku şixulandina hemwelatiyên astengdar di sektora rayagiştî û bi taybet de mecbûr dikin bi awayekî tam bê temînkirin.

Projeyên xanî yên ji bo astengdaran divê bên bipêşxistin.

Ji ber kulfetên zêde yên astengdariyê divê me'aşên astengdaran bê zêdekirin û dema xweyîkirina li malê divê alîkariya mehane bê kirin.

## 7 - MAFÊN GIRTÎ Û MEHKÛMAN

Bi rindkirina mercên girtîgehan, divê sererastkirinên ku rûmeta girtî û mehkûman, mafê wan yên bedenî û rûhî û mafên wan yên civakî têxe bin ewlehiyê bên kirin. Girtî û mehkûm, pey ku ji girtîgehê derketin ji bo karibin di nav jiyana civakî, aborî û çandî de ciyê xwe bigrin divê li girtîgehan perwerdehiya wan yê zanistî û pîşeyî bê kirin.

Girtî û mehkûmên zewicî ji bo ku karibin mehê herî kêm rojekê bi malbata xwe re biborînin divê îmkan bên çêkirin.

Pêwîst e dewlet alîkariye malbatên mehkûm û girtiyan yên ku nikarin debara xwe bikin bike.

Divê sitendina bihayê elektrîkê ji mehkûm û girtiyan bi dawî bibe.

Divê êdî berdêla î'aşê ya xwarina ku mehkûm û girtiyan li girtîgehê xwarine ji mehkûm û girtiyan êdî neyê sitendin.

Dema hevdîtina vekirî a mehkûman ku bi malbatên xwe re rasterast mehê carekê karin bikin divê bê zêdekirin.

Girtî û mehkûm, divê li hepsên herî nêzîkî îqameta malbata xwe bimînin. Divê ji tetbîqata nefya bi bal hepsên dûr ji malbata wan bê qerandin, ku ev yek bi awayekî kolektîf tê wateya cezakirina malbatên mehkûm û girtiyan jî di heman demê de.

Mehkûm û girtiyên dewamî nexweş û muhtacê xwedîkirinê, ji bo cezayê xwe li gorî serbestiya bi kontrol karibin li mala xwe bikişînin divê îmkan bên çêkirin.

Cezaya hepsa muebbet a ku rûmeta mirovan binpê dike bi rejima înfazê a taybet divê ji holê rabe.

## 8 - ÇAND Û HUNER

Divê li hember xirabûna exlaqî û çandî, neyartiya baweriyê, derxistina tiştên mustehcen û tundîtiyê bi bal pêş ve, têkoşîn bê kirin.

Divê çalakiyên çandî û hunerî yên ku ne li hember girîngiyê me û exlaqê ne bên teşwîq kirin.

Divê pirtûkxane bên zêdekirin, navendên çandê jî ji rewşeke nekargîn bên xilaskirin û ji bo bi hêsanî bên bikaranîn çi sererastkirinên divên bên kirin.

Ji bo temînkirina hînbûniya xwendina pirtûkan divê teşwîq bên kirin.

Divê li ser înternetê pirtûkxanetî bê bipêşxistin û ji bo suxreyê bê pêşkêş kirin ji gel re.

Divê piştgiriya dewletê ji çalakiyên çandî û hunerî yên weke şano û sînemayê re bi tenê di çarçoveya projeyan de be.

Divê ji bo di medyayê de bernameyên çandî, hunerî û perwerdekar zêde bibin hewesandin bê kirin.

Ji bo parastina mîrata çandî a girîngiya hevpar a hemî mirovahiyetê divê tedbîrên pêwîst bên sitendin.

## 9 - ÇAPEMENIYA NIVÎSKÎ Û DÎTBARÎ Û RAGIHAN

Bi awayekî azad nûçe girtin û pêşkêş kirina ramanên xwe, yek ji mafên bingehî yê mirovahiyê ye. Dema azadiya ragihan û hînkirinê a hemwelatiyan hat parastin divê ji jiyana bi taybet a mirovan re destûr neyê dayîn ji bo tu mudaxeleyê.

Ji bo ewlehiya jiyana bi taybet û ragihandinê divê çi tedbîrên zagonî pêwîst in bên sitendin.

Ji bo parastina azadiya sitendina agahî û nûçeyên rast û ji bo temînkirina azadiya ragihandin û çapemeniyê çi sererastkirinên zagonî pêwistin divê bên sitendin.

Divê di çapemeniya nivîsî û dîtbarî de keys neyê dayîn yekdestîbûn û karteltiyê.

RTUK'a ku medyayê kontrol dike, ji bo ku li ser medyayê nebe wasîteyeke zordariya siyasî sererastkirinên pêwîst divê bên kirin.

Ji bo ku sîstema ragihandinê bê gihîştandin standardên hemdem divê şebekeyên telekomunikasyon, radyo, televizyon û agahiyê yên ku îmkanên hilbijartinê yên alternatîf didin pêşiya kesê bikartîne bên avakirin û belavkirin.

## 10 - ZANIST Û TEKNOLOJÎ

Ji bo pêşketin û dewlemendbûna civakî, zanist û teknolojî gelek girîng in. Guherandina zanist û teknolojiyê bi bal feydeyên civakî û aborî ve, ji bo di pazarên dinyê yên ku mezin û global dibin de welat bibe xwedî aboriyeke reqabetker çalakiyên lêkolîn û pêşvebirinê divê di navenda polîtîkayên aboriyê de bin.

Divê para ji butçeya dewletê ji serfkirinên lêkolîn û pêşvebirinê re tê texsîs kirin bê zêdekirin, bi teşwîqên ku wê bên tetbîqkirin divê giraniya sektora bi taybet hê bêtir bê dayîn ser vê sehayê.

Divê mekteb û zanîngeh bi îmkanên ji teknolojiya herî dawî bên xemilandin û bibin hêlînên zanistê.

Divê bê temînkirin ku teknolojiyên nû bi lez bên anîn welêt û hevkariya zanîngeh û endustriyê bê lidarxistin.

## 11 - BAJARBÛN Û XANE

Di şûna bajarbûna ne di cî de û xirab, amanca me a yekem ev e ku; bajar bibin ciyên fireh û ji bo jiyanê minasib ku mirov hesreta wê dikişînin.

Divê pêşî li bajarbûna bê plan, avahiyên kaçax û li hember erdhejan ne zexm bê girtin.

Divê pirsgirêkên avahiya bingehî yên bajaran bên çareserkirin û di bajarên mezin de divê piştgirî û teşwîqa projeyên gihanî yên binî erdê bên kirin.

Di nav bajar de ji bo gel îstîraheta xwe bistîne û werzîşê bike divê hejmara seha û holên şîn bên anîn hejmar û wesfekî wisa ku mirov karibin bi tenduristî û hêsanî tê de bijîn.

Ji bo çareseriya kêşeyên gihanî yên bajarên mezin, divê bikaranîna wasîteyên gihaniyê yên tevahî û sîstema rayan bê belav û teşwîq kirin.

Ji bo parastina mîrata dîrokî û girîngiyên çandî divê fon ben texsîs kirin û zanîna civakê bê zêdekirin.

Di biryarên dê derheqê bajar de bên sitendin de divê tevlîbûna gel û saziyên civaka sivîl bê temînkirin.

## 12 - TRAFÎK

Ji bo di trafîkê de pêşî li ziyana can û mal bê girtin hê ji mektebên seretayî ve divê perwerdehî û zanakirineke bi bername bê xistin jiyanê.

Di bajarên ku nîspeta hejmara mirovan zêdeye de divê wasîteyên gihaniya tevahî yên bi ray bên zêdekirin û ji bo ewlehiya gihaniyê û maliyeta neqilkirinê bê daxistin divê li hemî welat trenên bi lez bên zêdekirin.

Rêyên ji hev hatine qetandin û projeyên otobanan yên hene divê bi lez bên temam kirin û dest bi projeyên nû bê kirin.

Ji bo ji butçeya dewletê re bibe fînansmaneke nû a malî divê ji şifêran re ceza neyê birîn. Polîs û personelên ku kontrola trafîkê dikin, ji bo ji amanca xwe ya sereke ku pêşîlêgirtina qezayan dibe ku bibin û perwerdekirina civakê di derbarê rêzikên trafîkê de ye dûr nebin divê perwerdehiya wan a navxizmetê bê kirin û ji bo pêşî li cezabirîna kêfî û neheq bê girtin kontrolên bes in bên kirin.

Ji bo ku pêşî li îsrafa dem û sotemeniyê bê girtin, divê teknîkên modern yên ku li gor zêdehiya sîstemên sînyalîzasyon a di trafîkê de tevdigerin bên bikaranîn û ji rêveberiyên mehellî re di vê derbarê de divê piştgiriya fînans û malî bê kirin.

Divê bikaranîna bisiklêtan bê teşwîq kirin û di bajaran de rêyên bisiklêta divê bên cudakirin.

## 13 - GIHANÎ

Ji bo trafîka li ser rêyên erdî bê kêmkirin û ewlehiya rêyan bê temînkirin, di birina rêwî û baran de divê giranî bê dayîn rêyên hesin û deryayê. Di gihaniya hewayî de divê hejmara teyare û seferan bê zêdekirin û ji bo gihaniya rêyên hesin bên leztir û ewletirkirin divê sîstemên rayan bên anîn standardeke hemdem.

Ji bo ewlehiya gihaniyê û daxistina maliyeta birin û anînê divê li hemî welêt trênên bi lez bên zêdekirin û belavkirin.

Divê kapasîte û standarda balafîrgehan bê zêdekirin û sazkirina kargehên hewageriyê yên taybet divê bên teşwîq kirin.

Avahiya bingehî ya navçe, belde û gundan, divê li gorî trafîka zêde dibe bên sererastkirin û standarda wan bê bilind kirin.

Ji bo candarkirina jiyana bazirganî û aboriyê, hêsankirina gihanî û zêdekirina têkiliyên mirovahiyê li ku dera pêdivî heye divê pir û rê bên çêkirin.

Di wasîteyên gihaniya civakî de, ji bona pîrek bi hêsanî û ewlehî rêwîtiyê bikin, wasîteyên bi taybet ji bona wan, di hemî welêt de divê bene belavkirin.

## 14 - HAWÎRDOR

Ji bo tenduristiya mirov parastina çavkaniyên xwezaî û pêşî girtina li qirêjkirina hawîrdor amanca me ya bingehî ye.

Divê bi rêxistinên civaka sivîl re yên ku di derbarê hawîrdor û xwezayê de çalakiyan dikin hevkarî bê kirin û zagonên ku di vê derbarê de rêveberiyên mehellî raydar dikin divê bên deranîn.

Pêwîst e polîtîkayên hawîrdor û xwezayê diparêzin bingeh bên sitendin. Divê bingeha zagonî bê çêkirin û pêşî lê bê girtin ku; sehayên şîn ji çêkirina avahiyan re bên vekirin û sehayên zîre'etê ji derveyê amanca zîre'etê re bên bikaranîn û sehayên bi bereket yên zîre'etê di endustriyê de bên bikaranîn.

Ji bo di temenên biçûk de zanîna hawîrdor bê dayîn zarokan, pêwîst e di derbarê hawîr û xwezayê de dersek bê xistin nav naveroka mektebên seretayî. Ji bo di nav civakê de di vê derbarê de zanîn û hesasiyetek bi pêş keve divê perwerdehî bê kirin.

Divê bi sedem îstîxdam û tirsên aborî destûr neyê dayîn endustrîbûna zirarê dide civakê, hawîrdor qirêj dike û xwezayê xira dike û ji bo pêşî li qirêjiya hawîrdor a ku bi sedem endustriyê çêdibe bê girtin û ji bo dewçinkên endustriyên bên xistin bin kontrolê sererastkirinên zagonî yên ku pêwîst in divê bên deranîn.

Di derbarê parastina hawîrdor û deryayan de divê bi odeyên meslekan re û bi rêxistinên civaka sivîl re hevkarî bê kirin.

Çiqas avên dewçink û çop zêde dibin, zirara wan a ji hawîrdor re jî zêde dibe. Di serî de li bajarên mezin divê bi rêveberiyên mehellî re hevkarî bê kirin û ji çavkaniyên rayagiştî ji bo çêkirina tesîsên rafînajê a dewçinkên hişk û avên qirêj rafînaj dikin fon bên cudakirin û van tesîsan bên avakirin û projeyên hene jî divê bi lez bên temam kirin.

Li herêmên heyelanê divê giranî bê dayîn çandina dara û pêşî li berî bûn windabûna axê bê girtin.

## 15 - TURÎZM

Em turîzmê bi tenê weke sektoreke ku ji aboriyê re mefadar e nanirxînin.

Em turîzmê, ji bo dostaniya navbera mirovên ser rûyê erdê dijîn bi pêşkeve, mirov hevûdin nasbikin û tevî mîrata mirovahiyetê di nav hev û din de par bikin wek wesîleyekê dibînin.

Bi vê amancê;

Divê turîzma kongre û fûaran bê belavkirin û di vê sehayê de bi şîrket û acenteyên rêwîtiyê yên ku çalakiyê dikin re divê hevkarî bê kirin û piştgiriya pêwîst e divê bê dayîn wan.

Ji ber Si'ûdî'Erebîstan kota datîne ser hejmara heciyan gelek Musulman bi salan li hêviya hecê dimînin. Ji bo kotaya tê dayîn welatê me bê zêdekirin û ji heciyên me

re hêsaniyên pêwîst bên temînkirin divê bi hukumeta Si'ûdî re di asta herî bilind de hevdîtinên pêwîst in bên kirin û ev kota bê zêdekirin.

Di oxira turîzmê de divê destûr neyê dayîn belavbûna bê exlaqî û fuhşiyatê û ji bo parastina exlaqê giştî a civakê divê tedbîrên pêwîst bên sitendin. Bi piranî divê giranî bê dayîn turîzma baweriyê.

Li potansiyela di wîzeya ku turîstên têne welêt hatiye danîn ber çava û dewamî ji aliyekî ve li turîzmê hatiye nihêrtin û kêşeyên hemwelatiyên me yên ku bi turîstî diçin derveyê welat hatine piş guh kirin. Di polîtîkaya turîzmê de ji bo hemwelatiyên me yên ku diçin derveyê welat li welatên diçinê kiryareke li gor rûmeta mirovahiyetê bibînin divê tedbîr bên girtin.

Ji bo hemwelatiyên me yên ku diçin derveyê welêt karibin ji welatên ku wîzeyê dixwazin bi hêsanî wîzeyê bistînin, divê bi van welatan re hevpeyman bêne kirin û ji bo hemwelatiyên me bi hêsanî karibin rêwîtiyê bikin çi pêwîst e divê ji wan re bê amadekirin.

Di oxira turîzmê de divê destûr neyê dayîn ku sehayên şîn bibin sehayên ji betonê û divê ji bo parastina avahiya xwezayî îhtîmam bê nîşandan.

# G - ENCAM

Bi wê baweriya ku xilasiya mirovahiyetê ji qeyrana manewî, ji feqîriya maddî, ji cudawazî û ‘eciqandinê bi tenê bi vegera bi bal afirîş û eslê ve pêkan e:

- Fermana qenciyê, men’a ji xirabiyê,
- Vejîn û jindana girîngiyên mirovahî û Îslamî yên me dikine em,
- Temînkirina kêfxweşî û aşîtiya civakî,
- Çêkirina zemîna bikaranîn û naskirina azadî û mafan,
- Xilaskirina mirovan ji bendetiya bendan û ji gorîbûna ji îdeolojiyan re û bi wan jîndana azadiya heqîqî,
- Hilgirtina girîngiyên civakê yên bingehî bi bal siyasetê ve û hakimkirina wan a li ser,
- Ne ku ahengdarkirina civakê bi sîstemê re, ahengdarkirina sîstemê bi baweriyên civakê re,
- Xistina can, mal, ol, ‘eqil û nifşê bin ewlehiyê,
- Ne ku bi qasî ku destûr tê dayîn, bi awayê ku pêwîst e temînkirina jiyandina baweriyê,
- Sazkirina sîstemeke perwerdehiyê a ku zanîn û hîkmetê dike yek û li ser wekheviya keysê hatiye avakirin,
- Xilaskirina aboriya welat, ji sermiyanê global a kapîtalist ku paşeroja welat xistiye bin îpotekê,
- Temînkirina dadmendiya civakî,
- Rakirina bê dadmendiyê di parvekirina hatiniyan de û belavkirina dewlemendiyê di nav hemî gel de,
- Çareserkirina kêşeya Kurd li ser bingeha dadmendiyê û pêşîgirtina li wê yekê ku kêşeya Kurd ji berjewendiyên siyasî re bê gorîkirin,

- Nûnertiya komên ji nûnertiya siyasî bêpar in,
- Temînkirina dadmendî, serxwebûn û bê alîtiya darazê,
- Danîna dadmendiyê li ser tewera têkiliyên derveyê welat, bi welatên cîran re bipêşxistina têkiliyên rind, ji bo hevaltiya bi dewletên zordar re alîgir û temaşevan nebûna ji zilmê re,
- Bi tevlîbûna gel çêkirina makezagoneke ku ji nêrîna îdeolojîk a dewletê ku cudahiyên ramanan qebûl nake hatiye paqijkirin û ji wesayetê hatiye safî kirin û ne ku sîstemê, gel derdixe pêş,
- Alînegirî û rêzgirtina ji azadiya ol, ujdan û rêxistîbûnê re û nebûna zordar û sansurvan,
- Bi tu awayî nîşannedana musameheyê ji êşkence û kirdarên xirab re,
- Bi pêşxistina aboriyeke ku pêşketina li ser hilberanê ji xwe re bingeh wergirtiye; pêşî li faîz, îsraf û girêdana bi derveyê welat re digre,
- Netewe, ol û zimanê wan çi dibe bila bibe, parêzerî û alîgiriya hemî mezlûm û mustez'efên li çar aliyê dinyê belav bûne,
- Temînkirina nêzbûn û yekîtiya cîhana Îslamê,
- Serbestkirina sernixumandin û hîcabê bê ku ferq bê xistin navbera sehaya bi taybet û rayagiştî,
- Tetbîqkirina polîtîkayên ku cudawaziya pozîtîf û ewwiliyê didin astengdar, jin û komên dezavantaj re,
- Xilaskirina xortên ku hêvî û paşeroja me ne ji alkol, tiryak û xortaniyeke ku meraqa wê li ser kêfê û sefahetê ye û çêkirina mercên ku wê wan bigerine nesleke ku bi girîngiyên me'newî ve hişk girêdayî ne û ferdên ji mirovahiyetê re mefadar in,
- Têkoşîna li hember xirabûna exlaqî û bêmanewiyata ku civakê îfsad dike,

- Di siyasetê de temînkirina fezîlet û rûmetê,
- Amanc û prensîbên Partiya Doza Azad in.
- Bê ku li hêviya berjewendî û destkeftinekê û li hêviya îltîfatekê be, hêvîkirina mukafata xwe bi tenê ji Xweda Te'ala, ji bo heq, ji bo gel, ji bo ummeta Îslamê bigihê yekbûnê, ji bo gelên li ser dinyê dijîn bi biratî bijîn, di xala gihîştina amancên ku me di bernameya xwe de cî daye wan, bi zanebûna ku bi tenê bi xwesteka Ellah Te'ala pêkan e ev tişt bibin; yên ku di vê baweriya me de ne, yên ku di derbarê paşerojê de hizrên wan hene, bi herkesên ku dê bi dilsozî ji bo avakirina civaka bi fezîlet dê hewl û xîret serf bikin, di vê rê de bi qasî îmkan û hêza me destûr bide em bi cehd in ku bimeşin.

**Doza me;**

Azadî ye,

Dadmendî ye,

Heqaniyet e,

Dawîbûna zilmê ye,

Aramî ye,

Aşîtî ye,

Pevgirtina mirovan e,

Biratî ye...

Amanca me bi tenê ev e.

Em bi hemî hebûna xwe ji bo vê amancê têkoşînê didin.

Bi vê hewla xwe ve em dixwazin herin
hafa Ellah Te'ala.

Hemî têkoşîna me ev e.

Hemî kesên ku hesreta dinyayeke bi heqaniyet û dadmendî dikişînin,

Û hemî kesên ku bi şahî dilên wan bi aramî û aşîtiyê tijî bûne em gazî

**HUDA-PAR**ê dikin.

www.hudapar.org

facebook.com/hur.dava

twitter.com/hurdavapartisi

HUDA PAR

# BERNAMEYA PARTIYA DOZA AZAD

2013

Partiya Doza Azad

**NAVENDA GIŞTI** **Tel:** 0312 472 48 32 **Fax:** 0312 42 48 38
Ehlibeyt Mah. Ceyhun Atıf Kansu Cad. 117/5 **Balgat - ANKARA**